Ferhanga Têgehên Zanistê ya bi tirkî, pirtûkên dersê wiha pênase dike: “Pirtûka ku di derheqê hinkirina dersekê de hatiye amadekirin an jî piştî lênêrîna gorî hin pîvanan bo dibistan, pol an jî dersekê ji mamoste û xwendekaran re wek pirtûka bîngehîn tê bijartin.”<sup>15</sup> Raporta “Nirxandina Pirtûkên Dersê” ya Wezaretê Perwerdeyê ya Tirkiyeyê (MEB) hînkerê wiha pênase dike “Pirtûka hinkirinê (ders kitabı) navendek e ku têde agahiyên mijarên di bernameya hinkirinê de cî digirin bi awayekî bipîlan û bisîstem vedikole û rave dike û wek çavkaniya agahiyan xwendekaran li gorî armancên dersê perwerde û beralî dike.”<sup>16</sup>

Ferhanga D.Îzolî<sup>17</sup> *hînkerê*, wek perwerdekar (öğreten, eğiten) pênase dike. Lê ji bo kurmancî, pêşniyara me ev e: *textbook* = *pirtûka dersê*, *coursebook*=*hînker*. Ji xwe ji pirtûkên hinkirina zimanî re bêtir *hînker* tê bikaranîn û ev yek jî li pênaseya *Oxford Dictionary*'ê jî tê.

<sup>14</sup> <http://www.oxforddictionaries.com/> “textbook” û “coursebook”, (ketina malperê 29.12.2014.)

<sup>15</sup> Türkiye Bilimler Akademisi Türkçe Bilim Terimleri Sözlüğü, “ders kitabı” <http://www.tubaterim.gov.tr/> (ketina malperê 29.12.2014.)

<sup>16</sup> İlköğretim Okulları Ders Kitaplarının Değerlendirmesi, MEB, Ankara, 2008. r.1.

<sup>17</sup> D.Îzolî, “Hînker”, *Ferheng*, Weşanên Deng, Amed, 2011

Di vê xebatê de jî wextê me têgeha *pirtûka dersê* bi kar anî armanca me *textbook* e, û bikaranîna *hînkê* jî cihê *coursebook*'ê digire. Di vê xebate me de gava “hînkê” tê nivîsîn mebest bi giştî pirtûkên perwerdeyê ne, û gava “Hînkê” tê nivîsîn jî mebest me pirtûka vê xebatê ye.

Hînkê gelek ji materyalên nivîskî (nivîsar, diyalog, metn û perçeyên xwendinê); bihîstyarî (diyalog û perçeyên bilêvkirinê yê li qeset û CDyan barkirî); û dîtbarî (wêne, karîkatûr û xêzên derheqê babetan); bihîstyarî û dîtbarî (film, filmên qarton hwd.) di nava xwe de dihûndurinin, ji ber vê taybetmendiya xwe, bi gotina Alan Cunningsworth ew ji bo bidestxistin û gehiştina armancên xwendekaran pêdiviyêke sereke ye.<sup>18</sup> “Hînkê ji bo mamosteyan materyala hînkirinê ye û ji bo xwendekaran jî materyala hînbûnê ye. Hêmaneke girîng a pêvajoya hînkirinê û hînbûnê ye.”<sup>19</sup>

Falk Pingel, di berhema xwe ya bi navê “*Ders Kitaplarını Araştırma ve Düzeltilme Rehberi –Unesco*” de wiha dibêje “pirtûkên dersê yek hêmanên perwerdeyê yê herî girîng in.”<sup>20</sup>

Wextê mijar dibe hînkê zimanî, divê ew wekî yek pirtûk neyê hesabandin û fêmkirin. “Gelek setên hînkê herî kêr ji pirtûkeke xwendekaran û yek mamosteyan pêk tê”<sup>21</sup> Lewra bi piranî pirtûkên hînkirinê zimanî ji setekê pêk tên ku di nav de ji yekê zêdetir pirtûk (gorî her astê pirtûkek û pirtûkên rahênan û spartekan, û pirtûka mamosteyan, pirtûkên xwendinê, ferhengok hwd.), kaset û CDyên guhdarîkirin û temaşekirinê, kaxizên fotokopîkirinê, grafîk û poster hene.<sup>22</sup>

Hînkê cara ewil li Misrê hatine bikaranîn û xwedî dîrokeke 4000 salî ne<sup>23</sup> û di nav hemû materyalên hînkê û alîkar de xwedî cihê girîng in. “Hînkê him ji bo xwendekaran him jî ji bo mamosteyan ‘îro jî’ çavkaniyêke bîngê in.”<sup>24</sup>

---

<sup>18</sup> Alan Cunningsworth, *hb.* p.7.

<sup>19</sup> Jai Raj Awasthi, “Textbook and its evaluation” *Journal of NELTA*, c.11, j.1-2, October 2006. r.1.

<sup>20</sup> Falk Pingel, *Ders Kitaplarını Araştırma ve Düzeltilme Rehberi –Unesco*, Tarih Vakfı Yayınları, 2004. r.1.

<sup>21</sup> Alan Cunningsworth, *hb.* p.25.

<sup>22</sup> Hitomi Masahura, Brian Tomlinson, “Materials for General English”, *English Language Learning Materilas*, ed. Brian Tomlinson, Continuum, New York, 2008, p.17.

<sup>23</sup> Nesrin Oruç, Berna Yavuz, *hb.* r.399. ; dîsa bnr. İlköğretim Okulları Ders Kitaplarının Değerlendirmesi, MEB, Ankara, 2008. r.2.

Ev ‘îro jî’ tê vê wateyê ku di vê serdema ku teknolojiya ragihandinê û ya dîtbarî ya wekî înternet û medyaya sosyal û hwd. de jî hînkera çapkirî (hard copy) bingeha gelek dersan pêk tîne. Ew hem materyalên dersê ne hem jî kurteya bernameya dersê ne, lewre hemû hînkêr li gorî bernameyê hînkirinê (syllabus) tî amadekirin. “Pirtûka dersê, ji aliyê bijartina materyalan ve alîkariya mamosteyan dike. ... Bi rêya materyalên ku di pirtûkê de li pey hev tî pêvajoya perwerdeyê qonax qonax bi rê ve diçe û bi vî awayî ve berdeamiya dersê pêk tî.”<sup>25</sup> Ji ber vê yekê di destê mamosteyan de bernameya dersê tunebe jî hînkêr bi tena serê xwe çarçoveyên bikêr in.<sup>26</sup> Heta Williams<sup>27</sup> pêngaveke din wêdetir diçe û wiha dibêje; “Tiştê gelekî tinazî ye ku ew mamosteyên bi rastî bêtir pala xwe didin pirtûkên dersê, ji wan mamosteyên ku xwedî kêmtirîn qabîliyeta şîrovekirina niyetên pirtûkê yan jî nîrxandina naverok û rêbaza wan in.

Lê ev nayê vê manayê ku divê hînkêr di dersan de her gav serdest be. Eger cihê mamosteyan bigire û hemû hînkirinê bigire bin kontrola xwe dê hêmanên din ên pêvajoya perwerdeyê pasîvîze bike. Hasan Ansary û Esmat Babaii<sup>28</sup> di xebata xwe ya ku tîde li taybetmendiyên navneteweyî yê hînkêran digerin, tînin ziman ku divê mirov barên giran li ser milên hînkêran bar neke, lewre ew çî qas jêhatî bin jî di dawiyê de yek jî materyalên di destê mamosteyan de ne, bikêriya wê girêdayî jêhatiya mamosteyan e. “Ji bo gelek mamosteyan îro jî rol û armancên hînkêran ne zelal in. Ew hînkêran bêtir wek bernameya dersê dibînin, ne wekî alîkarek.”<sup>29</sup> Di vî warî de şîroveya Alan Cunningsworth<sup>30</sup> jî di cih de ye. Lewre ew digel ku girîngiya pirtûka hînkirinê dizane û

---

<sup>24</sup> Deniz Özeş, *Textbook Evaluation in Foreign Language Teaching: Spot on, Grade 8 from Student's and Teacher's Perspectives*. (Teza lîsansa bilind a neçapbûyî), Uludağ Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Bursa 2012. r.1

<sup>25</sup> Melek Çakmak, “Yabancı Dil Öğretimi”, *Konuları Ders Kitabı İncelem Klavuzu/Yabancı Dil 4-8*, ed. Leyla Küçükahmet, Nobel Yayın Dağıtım, Ankara 2001. r.5-6

<sup>26</sup> Deniz Özeş, *hb.* r.4

<sup>27</sup> David Williams, “Developing criteria for textbook evaluation” *ELT Journal*, 37(3), 251-255 vgz. Hasan Ansary and Esmat Babaii, “Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation” <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/> (ketina malperê 10.12.2014)

<sup>28</sup> Hasan Ansary and Esmat Babaii, “Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation” <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/> (ketina malperê 10.12.2014)

<sup>29</sup> Bülent İnal, “Coursebook Selection Process and Some of the Most Important Criteria to be Taken into Consideration in Foreign Language Teaching”, *Journal of Arts and Sciences*, h.5, Mayıs 2006 r.21 <http://jas.cankaya.edu.tr/gecmisYayinlar/yayinlar/jas5/03-bulent.pdf> (ketina malperê 30.12.2014)

<sup>30</sup> Alan Cunningsworth, *hb.* r.7

cihê wê yê di dersê û bi giştî di perwerdeyê de, di asteke bilind de datîne jî serdestiya wê qebûl nake û ji bo qelîteya hilberên bernameya dersê vî halî tiştêkî xeternak dibîne:

*“Divê pirtûkên hînkirinê di gehîştina mebest û armancên ji berê ve li gorî pêdiviyên xwendekaran hatine danin wek çavkanî bên dîtin. Ango ew armancan diyar nekin û bixwe nebin armanc. Lewre karê me hinkirina ziman e, ne hinkirina pirtûkê. ... Têkiliya di navbera mamoste û pirtûka hînkirinê mijareke girîng e û ya baş ew e ku di navbera wan de hevkarîyeke bi wî şiklî hebe ku her dû alî jî li ser heman armancan li hev bînin û ji bo wan bi hev re bixebitin. Divê armancên pirtûkê û yên mamosteyî li hev bînin û her du alî jî bo tesbîtkirina pêdiviyên xwendekaran bi hev re bixebitin.”*

Hînkêr bîngeha dersan in. Li Emrîkayê xwendekar %80 î dema xwe ya di polê de bi pirtûka dersê û rahênanên wê ve diborînin.<sup>31</sup> Li gorî O’Neill li cihê bikaranîna materyalên kopîkirî yên cur bi cur “pêkan e ku %70 î dersê li ser hînkereke serkeftî pêk bînin”<sup>32</sup> Lê her hînkêr di heman astê de feyde nade, anga ne pêkan e ku her hînkêr di polê de û di çarçoveya bernameya hînkirinê de bi mebestên hînkirina zimanê bê bikaranîn. Di lîteratura perwerdeyê de, wek her zanyariyê, ji bo bikaranîn û nebikaranîna hînkêran û feyde û zêrêrên wan du fikrên cuda derketîne holê. Li jêr em ê li ser wan bisekinin.

### **1.2.1. Fikrên Alîgir ên Derbareyê Bikaranîna Hînkêran de**

Hînkêr bi mebestên cur bi cur di polê de tên bikaranîn. Sheldon<sup>33</sup> sê sedemên sereke yên pêdiviya bikaranîna hînkêran rêz dike, ku ew ji aliyê vegotin û rêbazê zêdetir bi aliyê dem û jîrekatîya mamosteyan ve girêdayî ne:

- Amadekirina materyalan bi tena serê xwe karekî zor e
- Di karê xwe yê hînkirinê de, dema mamosteyan ne pir zêde ye
- Tiştên derveyî dersê zêde astengiyê didin mamosteyan.

Di bikaranîna hînkêran de aliyên erênî û neyinî jî derdikevin meydana. Lê, li jêr em ê pêşî behsa aliyên erênî anga feydeyên hînkêran û fikrên alîgir ên bikaranîna hînkêran

<sup>31</sup> İlköğretim Okulları Ders Kitaplarının Değerlendirmesi, MEB, Ankara 2008. r.

<sup>32</sup> Richard O’Neill, “Are textbooks symptoms of a disease”, *Practical English teaching*, September 1993, p.12 vgz Sabriye Akiş, A Comparative Study of Coursebook Evaluation and Selection Principles of EFL Teachers at State and Private Schools, Teza Lîsansa bilind a neçapbûyî, Ankara 2006. r.15

<sup>33</sup> Leslie E. Sheldon, “Evaluating ELT Textbooks and Materials”, *ELT Journal*, 42/4 October, rr. 237-246.

rêz bikin, piştê jî em ê aliyên wan ên neyînî û fikrên dijberî bikaranîna hînkeran vebêjin.

Cunningsworth dibêje ku “wextê mijar dibe rola hînkeran divê ew di xizmeta mamoste û xwendekaran de bin, li ser wan hikimdar nebin.” Divê hînker bi tena serê xwe ne diyarkerên mijar û rêbazên hînkerinê bibin. Cunningsworth rola pirtûkên dersê bi vî awayî tîne ziman:

- Ji bo pêşkeşiya amrazan (devkî û nivîskî) çavkanî ne.
- Ji bo pratîka xwendekaran û têkiliyên ragihandinê çavkanî ne.
- Ji bo xwendekaran çavkaniyên xurt ên rêziman, bêje, dengsazî û hwd. in.
- Ji bo çalakî û rahênanên di polê de çavkanî ne.
- Bernameya fêrbûnê ne (armancên perwerdeyê yê ji berê ve hatine diyarkirin dide nasîn).
- Ji bo hînbûna xweser û xebata serbixwe çavkanî ne.
- Ji mamosteyên kêr tecrûbe re piştgirîyeke xurt in.<sup>34</sup>

Penny Ur jî bi nêrîna xwendekaran li mijarê dinêre. Li gorî wî, bi rêya hînkeran xwendekar di hînbûnê de xweser dibin, lewre dikarin bi tena serê xwe ji pirtûkê sûd wergirin. Ur wiha berdewam dike “... hînker rêya herî erzan a peydekirina materyalên hînkariyê ne”<sup>35</sup>

David Litz, di xebata xwe ya li ser nirxandina hînkeran de, li ser girîngiya wan a di birêvebirina polê (classroom management) disekine û dibêje ku ew di polê de dema vala nahêlin, bi vî awayî dema mamoste û xwendekaran tijî û bi hilber derbas dibe. Dîsa feydeyên wan ên di pîvan û nirxandina berhemên dersê bi vî awayî tîne ziman; “Hînker ji aliyê psîkolojîk ve bêhempa ne, lewre bi rêya wan em dikarin pêşveçûn û serkeftina xwendekaran bi awayekî şênber bipîvin.”<sup>36</sup>

Li gorî Hutchinson û Torres di pergala perwerdeyê de hînker navgînên herî guncav in. Ew jî bi metnan, bi rahênan û vegotinan ve naveroka dersê diyar dikin. Di

---

<sup>34</sup> Alan Cunningsworth, *hb.* r.7.

<sup>35</sup> Penny Ur, *A course in language teaching*, Cambridge University Press, 1996. vgz. Sabriye Akiş, *hb.* r.17.

<sup>36</sup> David Litz, “Textbook Evaluation and ELT Management: A South Korean Case Study.” *Asaian EFL Journal*, 2005. ji [http://www.asian.efl-journal.com/Litz\\_thesis.pdf](http://www.asian.efl-journal.com/Litz_thesis.pdf). vgz. Sabriye Akiş, *hb.* r.16.

xebata xwe ya li ser sedemên bikaranîna hînkeran de ev her du zanyar dibêjin ku *naverok* sedemê sereke yê bikaranîna hînkeran e. Bi gotineke din, ji ber ku li gorî xwendekaran hînker ‘çarçove’ û ‘rêber’ e ku di polê de û derveyî polê alîkariya wan dike. Di vê xebata Hutchinson û Torres hatiye dîtin ku li gorî xwendekaran, hînker herî zêde di çêkirina rahênan û çalakiyan, xebata serbixwe, çêkirina spartekan û amadekariya ezmûnan bi kêr e.<sup>37</sup>

Jack C. Richards, dibêje ku “li gorî peywenda bikaranîna xwe, hînker hem xwedî avantaj in û hem jî xwedî desavantaj in”.<sup>38</sup> Piştî jî feydeyên bikaranîna pirtûkên hînkerinê bi vî awayî rêz dike:

- Ew ji bo dersê çarçoveyek e, û bernameyê hînkerinê pêk tînin.
- Vegotina dersê standart dîkin.
- Qelîteyê didomînin.
- Bingeha çavkaniyên hînkerinê ne.
- Ew bikêrhatî ne (demê mamosteyan bikêrtir dîkin).
- Ji bo ziman model in û daneyan temîn dîkin.
- Mamosteyan pêşve dibin.
- Ji aliyê dîtbarî ve balkêş in.<sup>39</sup>

Arif Sariçoban jî li ser rol û girîngiya pirtûkên dersê disekine. Li gorî wî pirtûkên dersê ji yana rojane tînin polê, ji ber vê yekê divê ji aliyê kesên jêhatî û bi tecrûbe bîn amadekirin. Herwiha divê ji aliyê bikaranîna demê di polê de, ji bo mamosteyan bibin alîkar. “Divê ew pêşveçûna hêmanên zimanî, kurteya mijarên hînbûnê, rahênanên hêmanên zimanî û bêjeyan û hwd. nîşan bidin.”<sup>40</sup>

Li gorî Brian Tomlinson divê materyalên hînkariyê yê hînkerinê zimanî (di eslê xwe de Tomlinson têgeha ‘materyalên hînbûnê’ bi kar tîne) bi rêya axaftin û metnên nivîskî ve bibin çavkaniya zimanê otantîk (eslî) da ku xwendekar di bikaranîna ziman de pêşve biçin. Lîsteya jêr ji bo hînbûn û pêşveçûna ziman pêşniyar dike û rol û feydeyên hînkerên zimanî diyar dike;

<sup>37</sup> Tom Hutchinson, Eguene Torres, “The textbooks as an agent of change”, *ELT Journal*, 1994. j.48, r.315-328. vgz. Sabriye Akiş, hb. r.16.

<sup>38</sup> Jack C. Richards, hb. r. 254.

<sup>39</sup> Jack C. Richards, hb. r. 254-55

<sup>40</sup> Arif Sariçoban, hb. r. 15.

- Hinek ji wan (materyalên hînkariyê, bi taybetî hînker) çavkaniyêke dewlemend ya tecrûbeyê cureyên cuda yê metnên xwendinê ne.
- Hinek ji wan bi rêya xêz, wêne û dîzayna balkêş ve tecrûbeyêke erênî ya estetîk didin.
- Hinek ji wan bi riya çavkaniyên multîmedyayî tecrûbeyên dewlemend û cihêreng yê hînbûna zimanî didin.
- Hinek ji wan di keşfên nû de dibina alîkarê xwendekaran.
- Hinek ji wan dibin alîkarê xwendekaran da ku di warê hînbûna zimanî de serbixwe bibin....
- Hinek ji wan çavkaniya materyalên alîkar in û tecrûbeyêke mezin ya guhdarîkirinê yan jî ya xwendinê didin xwendekaran.
- Hinek ji wan ji aliyê kesandina tecrûbeyê hînkirinê ve dibin alîkarê xwendekaran.<sup>41</sup>

Gava mirov li listeya feydeyên hînkeran a Tomlinson dinêre, dibîne ku ew bêjeya ‘hinek’ bi kar tîne, yanî hemû hînker van feydeyan nadin, hinek ji wan didin. Ev yek nîşaneyê du tiştan e; a) Hemû hînker serkeftî nînin, hinek ji wan serkeftî ne, ji ber vê yekê jî ‘hinek’ feyde didin û hinek jî feyde nadin. b) Digel feydeyên hînkeran, zererên bikaranîna wan jî hene. Ji van du bijarteyan ya duyem guncavtir e, lewre hema bêje hemû zanyarên ku li ser hînkeran xebitîne, feyde û zererên bikaranîna wan bi hev re rêz dikin. Em jî dê niha gorî hin zanyaran zererên bikaranîna Hînkeran rêz bikin.

### 1.2.2. Fikrên Dijber ên Derbareyê Bikaranîna Hînkeran de

Herçiqas fikrên alîgir ên derbareyê bikaranîna hînkeran ji aliyê gelek zanyaran ve bîst parastin jî hinek zanyar hene ku li dijî bikaranîna hînkeran, an jî qet nebe li dijî serdestiya wan a di perwerdeyê de disekin. Li jêr em ê cihê bidin van fikrên dijber ên derbareyê bikaranîna hînkeran de.

Jack C. Richard di derheqê kêmasî û zererên bikaranîna Hînkeran wiha dibêje:

*“ji ber ku hin metnên pirtûkê bi taybetî ji bo hin kesan tê nivîsandin, dibe ku hînker xwedî zimanekî ne otantîk bin; ji ber ku pirtûkên hînkirinê bi piranî fikreke îdealîzekirî*

<sup>41</sup> Brian Tomlinson, “Language Acquisition and Language Learning Materials”, *English Language Learning Materilas* ed. Brian Tomlinson, Continuum, New York 2008. r.6-7.

*pêşkeş dikin, dibe ku ew mijara hînkirinê beralî bikin; ji ber ku hînker bi piranî ji bazara giştî ya dinyayê tîn amadekirin dibe ku ew pêdiviyên xwendekaran temsîl nekin; ji ber ku hînker, amadekirî tîn destê mamosteyan ev yek, rola mamosteya di amadekirina materyalan de kêr dikin û bi vî awayî dibe ku ew qabîliyeta mamosteyan ji holê rakin; li her aliyê dinayayê bihayê hînkeran zêde ye.*<sup>42</sup>

Herwiha Brian Tomlinson jî listeyeke dirêj a astengiyên ku ji materyalên hînkariyê derdikevin pêşkeş dike:

- Ew ji aliyê asta ziman û şiyana hişî ve xwendekaran kêr dihesibînin,
- Bi taybetî xwendekarên ku di asta ziman de nizm in, di asta întelektûeliyê de jî nizm tîn dîtin,
- Pêşkeşiya zimanî hêsan dikin û bi vî awayî tecrûbeya hînbûnê lawaz dikin,
- Bi rêbaza pêşkeşî/bikaranînîn/berhemdayîn (presentation/practice/production) ve xapandineke hînbûnê dikin ya ku bikaranîna zimanî xwerû dike û pêşveçûnê zimanî kêr dike
- Materyalên hînkariyê xapandineke din a hînbûna zimanî dikin ji ber ku li cihê jiberkirin, dubarekirin an jî bicîkirin û veguhestina metnekî ew temamkirina rahênanan têrî hînbûnê dibînin.
- Ji ber ku di dema rahênanên guhdarîkirin û xwendinê de hewl didin ku hêmanên zimanî hîn bikin ew hînbûna zimanî û pêşveçûna şiyanweriyan tevlihev dikin.
- Bi rêya metnên sade, biewle û biaheng xwendekaran ji hînbûneke bibandor dût dixin û wan dixin nav rahênanên ku ji fikirîn û hîskirinê bêpar in.
- Ew gelek zêde mînakên tecrûbeya zimanî ya bê peywend didin û gelek kêr bikaranîna bipeywend a zimanî pêşkeş dikin
- Ji aliyê bikaranîna zimanê li derveyî polê tê axaftin ve nikarin bi temamî alîkariya xwendekaran bikin.
- Bi rêya rahênanên ku tenê vekirin û şîfrekirina ziman dixwazin, materyalên hînkariyê tenê li aliyekî pêşveçûna zimanî hûr dibin û girîngiyê nadin aliyên din ên hînbûna zimanî.<sup>43</sup>

---

<sup>42</sup> Jack C. Richards, hb. r.255-56.

<sup>43</sup> Brian Tomlinson, hb. r.8.



Costas Gabrielatos<sup>44</sup> ji bo bikaranîna hînkeran sê probleman nîşan dide. Li gorî wî hînker her dem ji aliyê rêbazê ve ne zelal in. Dîsa her dem rêbaza ku pirtûk pêşniyar dike nikare bê bikaranîn. Herî dawî li gorî wî, pirtûka hînkirinê di her peywenda hînkirin û hinbûnê de ne guncav e. Ji van xalan Gabrielatos digehijê vê encamê: divê mamoste materyalên çapkirî (mebest materyalên hînkariyê yên çapkirî, di serî de hînker) gorî armancên dersan adapte bike.

Jixwe, bi rêya adaptekirin, veguherandin an jî nûkirina materyalên alîkar li gorî armancên ders û xwendekaran, kêmasî an jî astengiyên ku ji wan dertên dikarin ji holê bên rakirin, û bandorên wan ên neyinî dikarin ber bi erênî ve bên guherandin, da ku feydeya herî zêde ji ders û bernemaya hînkirinê bên wergirtin. Gabrielatos, ji bo adaptekirina materyalên hînkariyê, mamosteyan peywirdar dibinê, lê ev yek bi tena serê xwe têrê nake, divê haya mamosteyan ji xwe û ji rê û rêbazên hînkirina zimanî û ji zimanî bixwe hebe:

*“... ji bo adaptekirina guncav divê haya mamosteyan ji rêbaza nivîskarên hînkeran hebe û ev yek ji wan re hatibe vegotin an jî divê mamoste bikarin hebûna rêbazên nezelal bibînin. Wêdetir, divê haya mamosteyan ji nivenda rêbaza xwe, ango ji teorî û baweriyên xwe yên di derheqê ziman û hînkirin/hinbûnê de hebe.”<sup>45</sup>*

Ji van fikrên Gabrielatos jî diyar e ku, rola mamosteyan di polê de li ser materyalan de ye. Mamoste diyarker e, ew materyalan jê digire, bikartîne û dema ku pêwîst dibe gorî rewşa ders û xwendekaran wan adapte dike. Lê, divê şiyar û behremendiyên mamosteyan ên meslekî hebin. Divê mamoste, bi taybetî jî mamosteyên zimnaî xwedî behremendiyên nixandî, bijartin û bikaranîna materyalên hînkariyê, di serî de jî pirtûka hînkirinê bin.

Li gorî me fikrên zanyaran ên derbareyê bikaranîna hînkeran li cih in, ango ew di fikrên xwe yên alîgir û dijber de mafdar in. Bi rastî jî hem avantaj hem jî desavantajên bikaranîna hînkeran hene. Lê dîsa jî, bi ya me di dersan de ji bo mebesta hînkirina zimanî divê hînker bên bikaranîn, lê piştî adaptekirina wan li gorî armancên dersê û pêdiviyên xwendekaran da ku feydeya herê zêde ji wan bê wergirtin.

Di vê beşê de em li ser danasîn û dabeşkirina materyalên hînkariyê û hînkeran hûr bûn. Di beşa duyem de em ê behsa nixandî û bijartina pirtûkên hînkirina zimanî bikin.

---

<sup>44</sup> Costas Gabrielatos, *Shopping at the ELT Market: Principled Decisions and Practices*, U.S. Department of Education, Educational Resources Information Center (ERIC), 2000. r.3.

<sup>45</sup> Costas Gabrielatos, hb. r.3.

## BEŞA DUYEM

### NIRXANDINA MATERYALÊN HÎNKARIYÊ Û HÎNKERAN

#### 2.0 DESTPÊK

Di vê beşê de nirxandin, nirxandina materyalên hînkariyê û hînkeran, pîvan û modelên nirxandinê hînkeran bi rêzê ve dê bîn pêşkeşkirin. Herwiha em ê hewl bidin ku ji bo nirxandin û bijartina hînkerên kurmancî modeleke nirxandinê û listeyeke pîvanên nirxandinê pêşniyar bikin.

#### 2.1 NIRXANDIN

Nirxandin (evaluation/değerlendirme) nirxdayina hilberên çalakiyekê, pêvajoya diyarkirina qelîteya encam an jî/û berhemên kar û kiryarên pergalekê ye. Di jiyana xwe ya rojane de em gelek gotinên nirxdar dikin û wextê ji bo pêkanîna tiştê an jî çalakiyekê em di navbera du bijarteyan de dimînin li gorî hin pîvanan (pêwîstiyên me, bikêrhatina wî tiştî û hwd.) em di cih de nirxandinê dikin û hildibijêrin. Yan jî piştî pêkanîna û bicihanîna çalakiyekê, em di nava xwe de kar û zererên wê hesap dikin û kêrhatin yan jî ne kêrhatina wê bûyerê dipîvin. Weke ku Germaine û Dickins jî dibêjin: “Nirxandin... parçeyek ji jiyana me ya rojane ye.”<sup>46</sup>

##### 2.1.1 Nirxandin di Perwerdeyê de

Wek her pergalekê, di pergala perwerdeyê de jî hilber û berhem hene û divê qelîteya wan bi rêya hin pîvanan bîn diyarkirin. Di pergala perwerdeyê de nirxandin ji bo pîvana qîmeta berhemên wê tê kirin, “... nirxandin xaleke bingeşîn a pêvajoya hînkirin û hînbûnê ye.”<sup>47</sup> Lewre nirxandin nîşaneyê bicihanîna û geştiyê armancên taybet ên perwerdeyê ne, yê ku hem di bernameya perwerdeyê hem jî bernameya hînkirinê de hatine diyarkirin.<sup>48</sup>

Lî gorî Fred Genesee, “di hînkirina zimanî de, nirxandin pêvajoya berhevkirin, analîzkirin û şîrovekirina agahiyên di derheqê hînkirin û hînbûnê de ye û ew ji bo

<sup>46</sup> Pauline Rea-Dickins û Kevin Germanine, *Evaluation*, Oxford University Press, 1992, r.3.

<sup>47</sup> Pauline Rea-Dickins û Kevin Germanine, hc.

<sup>48</sup> Mustafâ Karaağaçlı, *Mesleki Eğitim ve Teknoloji Eğitiminde Özel Öğretim Yöntemleri*, Nobel Yayın Dağıtım, Ankara 2002, r.31.

biryargirtinên bikêr ên pêşveçûna xwendekaran û serkeftina bernameya perwerdehiyê tê kirin.”<sup>49</sup>

Di perwerdeyê de gelek cureyên nirxandinê hene û herwiha di gelek astên perwerdeyê de jî nirxandin tê kirin. Lê, wextê di perwerdeyê de behsa nirxandinê tê kirin bêtir wateya pîvana pêşveçûna xwendekaran (kur: pîvan, ezmûn; îng: assesment, testing; tr: değerlendirme/ sınav) tê bîra gelek kesan. Ev yek ne xelet e, lê kê m e, lewre pîvana pêşveçûna xwendekaran tenê aliyekî nirxandina perwerdeyê ye.<sup>50</sup>

Di perwerdeyê de nirxandin li ser van hêmanên perwerdeyê hûr dibe;

- a) *nirxandina bernameyê* (evaluation of program): Li vê derê armanca sereke diyarkirina kêrhatina bernameya perwerdeyê ye.
- b) *nirxandina pêşveçûna xwendekaran* (evaluation of student development): Ev nirxandin ji bo armancên wekî bicihkirin û diyarkirina pêşveçûna xwendekaran tê kirin û bi piranî bi rêya ezmûnan, testan an jî spartekan digehije mebesta xwe.
- c) *nirxandina materyalên hînkariyê û pirtûkên dersê* (evaluation of instructional materials and textbooks): Ev nirxandin di nava nirxandina binyad-pol ango nirxandina mijar û unîteyan, rêbazên vegotinê, rahênanên têkildar, materyalên tînan bikaranîn hwd. tê hesibandin.<sup>51</sup>

Dîsa li gorî Genesee çar hêmanên<sup>52</sup> eslî yê nirxandinê hene.

- Di serî de *diyarkirina armancan* heye, ango ji bo çî nirxandin tê kirin. Wek mînak, armanca nirxandinê dikare bibe pîvana pêşveçûnên xwendekaran di dersekê de.
- Piştî li gorî vê armancê *agahiyên tîkildar tînan komkirin*. Bo mînaka me, encamên ezmûnên xwendekaran, notên di derheqê performansa xwendekaran dikarin bibin agahiyên tîkildar.
- Di pêngava sêyem de li gorî pîvaneke diyarkirî *agahiyên tîkildar tînan analîzkirin û şîrovekirin*.
- Herî dawî jî li ber encamên analîz û şîrovekirinê *biryar tê wergirtin* ango biryara derbasbûn an jî mayînê; nûkirin an jî guhertinê tê wergirtin.<sup>53</sup>

<sup>49</sup> Fred Genesee, “Evaluation”, *The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages*, ed. Roland Carter & David Nunan, Cambridge University Press, 2001. r.144.

<sup>50</sup> Pauline Rea-Dickins û Kevin Germanine, hc.

<sup>51</sup> Fred Genesee, hc.

<sup>52</sup> Fred Genesee, hc.



**Şikil 2.1** Çar hêmanên bingehîn ên nirxandinê <sup>54</sup>

Li gorî Jack C. Richards<sup>55</sup> nirxandin bi piranî xwedî sê jêrecureyên bingehîn e. Ev cureyên nirxandinê bêtir ji bo nirxandina mifredat û bernameya dersê tên bikaranîn, lê ji bo her armancên nirxandinê pêkan in.

- Nirxandina avaker (Formative evaluation): Ev cure nirxandin bi piranî di nirxandina bernameya perwerdeyê de tê pêkanîn. Di dema sepandina bernameyê de, di nav heman çarçoveyê de tê pêkanîn. Ango pêşveçûn û bikêriya bernameyê di pêvajoya sepandinê de dinirxîne. Bi vî awayî jî, rêya guhertin û nûkirinê di dema sepandinê de li ber bernameyê vedike, lewma bi *nirxandina avaker* tê binavkirin.
- Nirxandina ronîker (Illuminative evaluation): Nirxandina ronîker, bi armancên nirxdayînê wêdetir, ji bo çawaniya sepandina hêmanên bernameyê tê pêkanîn.
- Nirxandina dawî (Summative evaluation): Ev cure nirxandin piştî sepandina bernameyê tê pêkanîn. Li gorî hilberên derketine meydanê, bernameyê dinirxîne.

<sup>53</sup> Fred Genesee, hc.

<sup>54</sup> Fred Genesee, hb. r.145.

<sup>55</sup> Jack C. Richards, hb. r.287-288.

Ji aliyê mamoste û çêkerên bernameyan ve gelek tê bikaranîn. Li gorî encamên ezmûnan biryardayîna serkeftin an jî binketina xwendekaran mînaka *nirxandina dawî ye*.

### 2.1.2 Nirxandina Materyalên Hînkariyê

Li gorî Cunningsworth<sup>56</sup> ji ber ku gelek hêmanên diyar û nediyar bandorê lê dikin, nirxandina hînkeran (û herwiha ya hemû materyalên hînkariyê ) ne karekî hêsan e. Beriya derbasbûna nirxandina materyalên hînkariyê, divê rola wan û bikaranîna wan bê zelalkirin. Materyalên hînkariyê çi ne, di pêvajoya perwerdeyê de ji bo kîjan armancan û bi çi awayî tînan bikaranîn. Rea-Dickins û Germaine<sup>57</sup> di derbareyê zelalkirina vê mijarê van her sê pirsan dikin:

1. Gelo ji materyalên hînkariyê mebesta we bi taybetî pirtûkên dersê ne, yan pirtûka mamosteyan, rêbera hînkirinê, unîteyên alîkar, pirtûkên xwendinê, materyalên dîtbarî û bihîstbarî hwd. jî tê de hene?
2. Hûn tu cudahiyan di navbera materyalên ku ji bo zimanê dayikê û yê biyanî hatine amadekirin didanin yan na, û dîsa di navbera materyalên ku bi taybetî ji bo bikaranîna di dibistanan de hatine amadekirin û yê ne-pedagojîk lê otantîk tu cudahî hene yan na?
3. Hûn materyalên ji aliyê mamoste û xwendekaran ve hatine amadekirin jî dihesibînin yan ne?

Ev pirsên jorîn ji bo diyarkirina çarçoveya nirxandina materyalên hînkariyê girîng in, lewre bêyî çarçove û armanceke diyarkirî nirxandin encamên bikêr nadin. Tomlinson<sup>58</sup> jî balê dikêşîne ser vê mijarê û dibêje ku sirûştê sêbjektîv ya navgînên nirxandin û lêkolîneran pirsgerêkeke mezin a nirxandina materyalên hînkariyê ye.

Piştî çarçovedananê, xaleke din a girîng jî diyarkirina armancên nirxandinê ye. Nirxandina materyalan ji bo çi tê kirin? Ji bo bijartina materyalên nû, ji bo diyarkirina bikêriya wan yan jî ji bo veguhestin û venûkirina wan? Bersiva van pirsan ji bo diyarkirina rêbaz û modela nirxandina materyalên hînkariyê agahiyên bikêr didin me.

---

<sup>56</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.5.

<sup>57</sup> Pauline Rea-Dickins and Kevin Germanine, hb. r.28.

<sup>58</sup> Brian Tomlinson, "Materials development", *The Cambridge Guide to Teaching English to Speakers of Other Languages*, ed. Roland Carter & David Nunan, Cambridge University Press, 2001, r.69.

Jixwe ev yek ango agahî berhevkerin yek ji hêmanên bingehîn ên pêvajoya nirxandinê ye.

## 2.2 NIRXANDINA HÎNKERAN

Wek li jorîn (di bin navê 1.2 de) jî hat diyarkirin, bi taybetî di dersan de û bi giştî jî di pergala perwerdeyê de wek materyaleke hînkariyê, rol û girîngiya hînkeran bêhempa ye. Lê tu hînker bê kêmasî nînin. Lewma divê hemû hînkerên di bazarê de, bi hal û awayê hazir ve, ji bo armancên perwerdeyê neyên bikaranîn. Divê ji nava hînkeran, a herî zêde li armancên perwerdeyê û pêwistiyên xwendekaran tê û ya herî bikêr bê bikaranîn. Heke di bazarê de hînkerên herî bikêr neyên peydakirin wê demê divê yê mawcûd li gorî armancên perwerdeyê û pêdiviyên xwendekaran bîn adaptekirin. Cunningsworth, di vî warî de wiha dibêje: “Tu pirtûkên ku di bazarê de cih digirin, bi temamî li xwendekarên we nayên, lê belê armanca bingehîn peydakirina guncavtirînê wan e, digel ihtimala adaptekirin an jî piştgirîkirina aliyên wan ên kêr û/an neguncav.”<sup>59</sup> Ji bo pêkanîna vê peywirê jî nirxandina hînkeran lazim e.

### 2.2.1 Armancên Nirxandina Hînkeran

Nirxandina hînkeran ji bo armancên cuda cuda tê kirin. Lê ji nava van armancan, nirxandina hînkeran ji bo sê armancên sereke tê kirin. Ya ewil, ji bo bijartina guncavtirînê hînkeran ya ku li armancên dersê û pediviyên xwendekaran tê. Ev nirxandin di serê serdemê yan jî di serê sala perwerdeyê de tê kirin. Wextê ku di bazarê de ji yekê zêdetir hînker hebin û mafê bijartinê ji bo mamosteyan hebe<sup>60</sup>, divê bi riya beralîkirina wan, ya herî bikêr bê bijartin. Ji bo vê yekê “divê armancên bernameya dersê bîn diyarkirin û piştî rewşa hînbûn û hînkirinê ya ku dê materyal tê de bê bikaranîn, bê analîzkirin.”<sup>61</sup>

Armanca duyem jî ev e; nirxandina hînkeran ji bo nirxandina bernameya dersê tê kirin. Lewre hînker yek ji hêmanên bingehîn ên bernameya dersê ne. Wextê ew tên nirxandin, di heman demê de bernameya dersê jî ji aliyekî ve tê nirxandin. Bi vî awayî mamoste lihevhatina armancên diyarkirî yê bernameya dersê û pratîka xwe dibînin.


---

<sup>59</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.5.

<sup>60</sup> Li dewletên wekî Tirkiyeyê, pirtûkên dersê ji aliyê wezaretê perwerdeyê yan jî ji aliyê desteyeke bilind tên diyarkirin û mamosteyên di dibistanan de mecbûr in ku wan pirtûkan bikarbin. Tenê li dibistanên taybet û kursan mamoste dikarin pirtûka xwe ya dersê hilbijêrin.

<sup>61</sup> Alan Cunningsworth, hc.

Nirxandina hînkeran ya ku ji bo diyarkirina aliyên wê yên serkeftî, kêr û neguncav tê kirin, armanca sêyem pêk tîne. Ev nirxandin di dema bikaranîna pirtûkê de, yan jî de dawiya serdem an jî sala perwerdeyê tê kirin. Heke piştî nirxandinê, aliyên kêr û neguncav yên hînkerê hatin peydakirin wê demê ew alî tîna temamkirin an jî adaptekirin. Yan jî dev ji bikaranîna hînkerê tê berdan û hînkerê din a baştir û guncavtir tê bikaranîn. Lê heke hînker li armancên bernameya dersê û pêdiviyên xwendekaran hatibe û bûbe sebebê hînbûn û pêşveçûnê, wê demê tu pêwistî bi guhertina hînkerê namîne û heman pirtûk ji bo heman mebestan dîsa tê bikaranîn.



**Şikil.2.2.** Sedemên nirxandinê (Reasons for evaluation)<sup>62</sup>

Alan Cunningsworth<sup>63</sup> van armanca bi “lêgerîna guncavti”yê nav dike. Ango guncavtiya hînkerê digel armancên xwendekaran, zanînen wan û çavkaniyên mawcût. Piştî dibêje ku hin caran nirxandina hînkeran ne ji bo armanceke diyarkirî, lê ji bo potansiyelên pirtûkê bixwe tê kirin. Ev cure nirxandin li zaningehan yan jî di komxebatên li ser nirxandin û bijartina materyalan de bêtir tê dîtin.

### 2.2.2 Pîvanên Nirxandina Hînkeran

Di nirxandina hînkeran de armanc her çî be jî, divê nirxandin li gorî hin pîvanên diyarkirî bê kirin. Ango divê nirxandin sîstematîk be, ne lêrasthatinî. Gelek zanyarên vê qadê li ser diyarkirina pîvanên nirxandina hînkeran berhem dane û dîsa li ser materyalên

<sup>62</sup> Pauline Rea-Dickins, Kevin Germanine, *Evaluation*, Oxford University Press, 1992, r.10.

<sup>63</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.15.

hînkariyê hûr bûne û her yekî ji wan li gorî nêrînên xwe hin pîvan rêz kirine. Hejmara pîvanan jî qasî diyarkirina wan girîng e. Di vî warî de Cunningsworth wiha dibêje: “Divê hejmara pîvanên tên bikaranîn û pirsên tên pirsîn, sînorkirî bin da ku hevsengiyek derkeve holê. Heke ne wiha be em ê di nav deryayeke hûrguliyên de winda bibin.”<sup>64</sup>

Diyarkirina pîvanan bêtir li bin sernavên giştî de hatiye kirin. Wek mînak Cunningsworth<sup>65</sup> pîvanên nirxandina hînkeran li bin van sernavên giştî rêz dike û di çarçoveya van pirsan de çil û heft pîvanan diyar dike: *Armanç û nêrîn, dîzayn û plansazî, naveroka zimanî, (çar)şiyanyewerî, mijar, rêbaz (metodolojî), pirtûka mamosteyan, nêrînên kêrhatî*. Ev hemû sernav jî li bin banê çar “rêberên nirxandinê” tên komkirin:

Rêbera yekem: Divê hînker li pêdiviyên xwendekaran bê. Divê ew armancên bernameya hînbûna zimanî bi cih bînin.

Rêbera Duyem: Divê hînker bikaranîna zimanî (niha û paşerojê) ya ku ji aliyê xwendekaran ve tê kirin nîşan bide. Divê hînkerên ku xwendekaran ji aliyê bikaranîna zimanî ve pêşve dibe bê hilbijartin.

Rêbera Sêyem: Divê hînker pêdiviyên xwendekaran li ber çavan bigirin û pêvajoya wan a hînbûnê hêsan bikin, tenê “model”eke hişk nedin wan.

Rêbera Çarem: Divê hînker bi zelalî piştevaniya hînbûnê bikin. Wekî mamosteyan ew jî di navbera zimanê hînbûnê û xwendekaran navgîn in.

Dikare bê gotin ku ev her çar rêberên Cunningsworth çarçoveya giştî ya modela wî ya nirxandin û bijartina hînkeran pêk tînin. Lewre di pirtûka xwe ya bi navê “Selecting your coursebook” de di bin banê van rêberan de li ser hemû rol, girîngî û armancên bikaranîna hînkeran kurteyêke zelal rêz dike. Tiştê ku Cunningsworth herî zêde li ser disekine, serdestî yan jî bindestiya hînkeran e. “Divê hînker ji aliyê bernameya hînbûnê û hînkirinê ve bînin diyarkirin, ne berevajiyê vê, lewma hînker xîzmetuzar e, ne efendî”<sup>66</sup>

---

<sup>64</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.5.

<sup>65</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.3-4.

<sup>66</sup> Alan Cunningsworth, hc.



**Tablo 2.1** Tabloya Pîvanên Ansary û Babaii<sup>67</sup>

<p><b>1- Nêrîna Giştî</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>❖ Belavbûna nêrîneke giştî (teorî û nêrîn) di derheqê; <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Sirûştta zimanî</li> <li>▪ Sirûştta hînbûnê</li> <li>▪ Teorî çawa dikare bê sepandin</li> </ul> </li> </ul>	<p><b>3- Dîzayna Fizîkî</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Giranî û ebata guncav</li> <li>▪ Lihevhatina balkêş</li> <li>▪ Qewînî</li> <li>▪ Qelîteya bilind a edîsyon û çapê</li> <li>▪ Sernavê guncav</li> </ul>
<p><b>2- Pêşkeşiya Naverokê</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>❖ Danasîna sedem û armancan <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Ji bo temamê kursê</li> <li>▪ Ji bo her unîteyê</li> </ul> </li> <li>❖ Bijartin û mentîqa wê <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Berg</li> <li>▪ Rêzkerin</li> <li>▪ Plansazî</li> <li>▪ Senifandin</li> </ul> </li> <li>❖ Xweşhaliya bernameyê <ul style="list-style-type: none"> <li>➤ Ji bo mamoste <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Peydakirina pirtûkeke rêber</li> <li>▪ Li ser rêbazan penndayîn</li> <li>▪ Lêhûrbûnên teorîkî</li> <li>▪ Mifteya rahênanan</li> <li>▪ Materyalên temamker</li> </ul> </li> <li>➤ Ji bo xwendekaran <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Pêşkeşiya bi pêngav pêngav, bi unîte unîte</li> <li>▪ Grafîkên eleqedar, bê hûrguliyên vala, bi reng, û hwd.</li> <li>▪ Venêrînên demkî</li> <li>▪ Pirtûka spartekan</li> </ul> </li> <li>➤ Rahênan û çalakî <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Di polê de</li> <li>▪ Spartek</li> <li>▪ Rahênanên mînak digel rêberan</li> <li>▪ Cure cure û kopîkirî</li> <li>▪ Testên demkî</li> <li>▪ Digel alîkarên bihîstyarî û dîtbarî</li> </ul> </li> </ul> </li> </ul>	<p><b>4- Endîşeyên Gerîndeyî</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>▪ Polîtîkayên makro</li> <li>▪ Guncavtiya li rewşa herêmi</li> <li>▪ Çand</li> <li>▪ Dîn</li> <li>▪ Zayend</li> <li>▪ Buhayê guncav</li> </ul>

<sup>67</sup> Hasan Ansary and Esmat Babaii, hc.

Hasan Ansary û Esmat Babaii<sup>68</sup> jî di bin navê “taybetmendiyên navnetewî yên hînkeran” de pîvanên xwe yên nirxandin û bijartina pirtûkan rêz dikin. Ew wan pîvanan di bin çar sernavên giştî de diseniffnin û li ser çil û sê aliyên hînkeran hûr dibin.

Carol Griffiths<sup>69</sup> di gotara xwe ya bi navê “*Evaluating materials for teaching English to adult speakers of other languages*” de dibêje ku gelek hêman hene ên ku bandorê li nirxandina materyalan dikin. Piştê jî duwanzdeh pîvanên xwe rêz dike. Ew di van pîvanan de bêtir li ser têkiliya materyalan û xwendekaran, hesasiya materyalan a li hemberî zayend û temen disekine. Em ê li jêr pîvanên Griffiths yên nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran rêz bikin û fikr û şîrovevên xwe jî li bin wan bidin:

▪ **Gelo materyal li armancên xwendekaran tê?**

Divê materyal li gorî armancên xwendekaran bê bijartin. Materyal armancan diyar nakin, ew ji bo gehiştina armancan tenê navgîn in. Lewre divê ewil di çarçoveya bernameya dersê de armancên xwendekaran bîn diyarkirin û piştê jî bo gehiştina wan armancan materyal an jî hînkera herî bikêr bê bijartin. Bi vî awayî wextê nirxandina materyalan tê kirin, li gorî Griffiths, divê di serî de ev pirs bê pirsin; “gelo materyal li armancên xwendekaran tê?”

▪ **Gelo materyal xwendekar-navendî ye?**

Divê materyalên tîn pejirandin xebata xwendekararan ya bi tena serê xwe hêsan bike. Bi gotineke din divê hînkêr ji aliyê rêberî, pêşkeşî û hwd. zelal bin. Bi vî awayî ve dibin xwendekar-navendî. Ango hînkêr divê hêsaner be. Li ber hînbûnê şexsî rêvê nû veke.

▪ **Gelo materyal hînbûna înteraktîf hêsan dike?**

Xwendekar bi danûstandin û têkiliyên di navbera hevalên xwe yên di polê de jî gelek tiştan hîn dibin. Lewma divê hînkêr bi rêya rahênanên komê, du kesane hwd. rê li ber çalakiyên di navbera xwendekaran veke.

---

<sup>68</sup> Hasan Ansary and Esmat Babaii, “Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation” *The Internet TESL Journal*, <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/> (ketina malperê 10.12.2014)

<sup>69</sup> Carol Griffiths, “*Evaluating materials for teaching English to adult speakers of other languages*”. *ELT forum* c.33 h.3, 1995, r.50. <http://dosfan.lib.uic.edu/usia/E-USIA/forum/vols/vol33/no3/p50.htm> (ketina malperê 12.12.2014)

- **Gelo materyal ji aliyê civakî-çandî ve guncav e?**

Ziman ji her alî ve bi çandê ve girêdayî ye. Lewma divê haya hînkerên ziman ji çandên cuda û taybetmendiyên wan hebe. Divê hînker xwe ji her cure ‘henekên’ biçûkxistinê yên li ser çandên biyanî dûr bixin.

- **Gelo materyal ji aliyê zayendên civakî ve hesas e?**

Wêxtê hesabûna zayendên civakê tê rojevê ew bi piranî derheqê jinan de ne. “Divê materyalên ku bi îsrar jinan bindest û biçûkxistî resm dikin bên redkirin.”<sup>70</sup>

- **Gelo materyal nû ye?**

Her çiqas materyalên kevin jî bikêr bin, heke di dest de hebin divê materyalên ku nû hatine amadekirin bên bikaranîn.

- **Gelo bêje û daneyên têgehiştinê baş hatine rêz kirin?**

Divê naverok, dane û mijar di hînkerê de li gorî ast û pêşveçûna xwendekaran bên bicihkirin û rêza wan a hînkirinê baş bê diyarkirin. Lewre mijarên ji bo asta destpêkê dikarin ji bo xwendekarên asta bilind pir hêsan û nebi kêrhatî bin û beravajiyê wê jî dibe, ango dibe ku mijarên asta bilind ji bo xwendekarên di asta destpêkê de zor û nebi kêrhatî bin.

- **Gelo materyal li temenê xwendekaran tê?**

Materyal ji bo zarokan hatine amadekirin yan ji bo navseran? Lewre pedagojî (perwerdeya zarokan) û androgojî (perwerdeya navseran) du qadên cuda ne. Lewma rê, rêbaz û zimanê hînkirina zimanî ji bo her yek qadê ji hev cuda ne. Wek mînak, “divê lehengên materyalên ji bo navseran tî amadekirin ji navseran bî bijartin”<sup>71</sup> û lehengên materyalên ji bo zarokan tî amadekirin jî zarok bin.

- **Gelo materyal bi taybetî ji aliyê dîtbarî ve balkêş e?**

Materyal û hînkerên ji bo zarokan tî amadekirin divê ji aliyê dîtbarî ve serkeftî bin, bi xêz û wêneyên balkêş bî xemilandin. Lê, divê materyalên ji bo navseran tî amadekirin jî li gorî eleqe û meyla wan bî dîzaynkirin.

- **Gelo materyal bi jiyana rastî ve têkildar e?**

Ev yek bi otantîkiyê, ango bi rasteqîniya materyalan ve girêdayî ye. Hînkerên ku bêtir metnên çêkirî û hûnandî dihûndirînin ji jiyana derveyî polê, ango ji jiyana rast a rojane dûr in.

---

<sup>70</sup> Carol Griffiths, hc.

<sup>71</sup> Carol Griffiths, hc.

▪ **Gelo bikaranîna materyalî hêsan e?**

“Divê materyal qewîn, baş organîzebûyî û baş fîhrîstkirî bin, ... da ku hêmanên cuda yê materyalan (ango pirtûk, qaset, vîdyo) bi hev re baş bîn bikaranîn.”<sup>72</sup> Ev lihevkerin hem hînbûna di polê de hem jî hînbûna bi tena serê xwe hêsan dike.

▪ **Gelo materyal çî qasî etno-sentrîk e?**

Materyala ku hatiye amadekirin çiqas di bin bandora nêrîna çanda nivîskarî de ye. Lewre, bi taybetî pirtûkên ji bo hînkirina inglîzî hatine amadekirin pîranî bi nêrîneke avro-sentrîk li dinyayê dinêrin.

**Tablo 2.2** Pîvanên A. Tucker<sup>73</sup>

I. PÎVANÊN NAVEROKÎ	II. PÎVANÊN DERVEYÎ
<ul style="list-style-type: none"> <li>❖ PÎVANÊN BILÊVKIRINÊ</li> <li>○ Bêqisûriya pêşkeşiyê</li> <li>○ Guncavtiya pêşkeşiyê</li> <li>○ Bêkêmasiya pratîkê</li> <li>❖ PÎVANÊN RÊZIMANÊ</li> <li>○ Bêkêmasiya mijaran</li> <li>○ Rêzkirina guncav</li> <li>○ Bêkêmasiya nîşandana qalib û modelan</li> <li>○ Bêkêmasiya pratîkê</li> <li>❖ PÎVANÊN NAVEROKÊ</li> <li>○ Bicîhkirina kêrhatî</li> <li>○ Rêje û şeweya dane û barkirina wan</li> <li>○ Guncavtiya peywend û rewşê</li> </ul>	<ul style="list-style-type: none"> <li>○ Otantîkiya zimanî</li> <li>○ Bidestxistina materyalên alîkar</li> <li>○ Rêbertiya ji bo mamosteyên biyanî</li> <li>○ Behremendiya nivîskarî</li> <li>○ Guncavtiya biyekbûnê (entegrasyon)</li> <li>○ Qewînî</li> <li>○ Qelîteya edîsyon û çapê</li> <li>○ Biha &amp; nirx</li> </ul>

Allan Tucker<sup>74</sup>ê ku dikare wek pêşengê nirxandin û bijartina materyalan bê dîtin, pîvanên xwe yê derbareyê nirxandin û bijartina pirtûkan di bin du modelên giştî de

<sup>72</sup> Carol Griffiths, hc.

<sup>73</sup> Alan Tucker, hc.

kom dike. (1) pîvanên naverokî (internal criteria) yên ku bêtir di derbareyê zimanî û naverokê de ne û (2) pîvanên derveyî (external criteria) yên ku li ser hin aliyên cuda yên hînkerê hûr dibin. Tucker di çarçoveya modelê ewil de, di bin banê sê sernavên giştî yanzdeh pîvanan rêz dike. Di çarçoveya modelê duyem de jî heşt pîvan cih digirin.

Zanyarekî din ê li ser nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê xebitiye Penny Ur<sup>75</sup> e. Wî jî bêyî sernav şanzdeh pîvan rêz kirine ku mirov dikare wan di bin sernavên wekî *pratîka bilêvkirinê, pêşkeşiya rêzimanê, rêzkirin û senifandin (a mijarên hînkirinê), di pêşkeşiyê de nêrînên pedagojîk û çandînî, pratîka bêjeyan, mijarên di derheqê xwendekarên cuda* rêz bike. Pîvanên Ur gelekî zêde di bin bandora pîvanên Tucker de ne.

Bülent İnal<sup>76</sup> dibêje ku beriya diyarkirina pîvanên nirxandinê divê bi awayekî serkeftî pêwistiyên xwendekaran bîn diyarkirin, piştî jî wek pîvanên nirxandin û bijartina hînkeran van pirsan dipirse:

**Tablo 2.3** Pîvanên Bülent İnal

1- Mijar û naveroka pirtûkê li armancên we tîne?
2- Pirtûk ji bo xwendekaran balkêş e?
3- Zimanê pirtûkê eleqedar û zelal e?
4- Mijarên hînbûnê pircureyî ne?
5- Mijar otantîk in?
6- Mijar xwendekaran pêşve dibin?
7- Metnên mijara hînbûnê zanîna giştî ya xwendekaran bilind dikin?
8- Ji bo her mijarê armancên zelal hatine danandin?
9- Di pirtûkê de hesasiya çandî heye?
10- Armancên hînkerê li armancên giştî yên hînbûn û hînkirina di dibistanê de tîne?

<sup>74</sup> Alan Tucker, "Evaluating beginning textbooks" *English Teaching Forum*, 1975, h. 13, 355-361. vgz. Hasan Ansary and Esmat Babaii, "Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation" *The Internet TESL Journal* <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/> (ketina malperê 10.12.2014)

<sup>75</sup> Penny Ur, hb. r.184-187. vgz. Hasan Ansary and Esmat Babaii, "Universal Characteristics of EFL/ESL Textbooks: A Step Towards Systematic Textbook Evaluation" *The Internet TESL Journal*. <http://iteslj.org/Articles/Ansary-Textbooks/> (ketina malperê 10.12.2014)

<sup>76</sup> Bülent İnal, hb. r.25.

Pîvanên Înal bêtir di bin bandora Griffiths<sup>77</sup> de ne. Ew jî wekî Griffiths li ser lihevhatina armancan, qelîteya mijaran û herwiha pircureyîbûn û otantîkiya wan, pêşveçûna xwendekaran, hesasiya çandî hwd. disekine. Lê, xalên ku pîvanên Înal ji xalên Griffiths û zanyarên din cuda dike, girîngiya ku ew dide mijarên hînkirinê ye. Li gorî me, du xalên herî balkêş yê di pîvanên Înal de cih digirin pîvanên heftem û heştem in. Bi wan pîvanan ew li qelîteya giştî ya mijaran û lihevhatina wan a digel armancên taybet digere. Lewre bi giştî armancên dersê hebin jî, li gorî wî divê her mijar jî xwedî armanceke taybet be û xwendekaran ji hin aliyan ve pêşve bibe.

Jo McDonough û Christopher Shaw<sup>78</sup> di berhema xwe ya bi navê *Materials and Methods in ELT: A Teacher's Guide* de di bin banê sê sernavên giştî sêzdeh pîvanan pêşkeş dikin. Li gorî van zanyaran divê nirxandina hînkaran kurt be, bi hêsanî bê tetbîqkirin û krîterên dorpêçker bihewîne. Jixwe dema mirov li pîvanên McDonough û Shaw dinêre, dibîne ku ew ji vê rêya xwe derneketine û pîvanên bikêr derxistine meydanê.

Dîsa zanyerekî din, Wolfgang Petter<sup>79</sup> di gotara xwe ya bi navê *A Coursebook Evaluation* de nirxandina hînkereke zimanê inglîzî ya li Aûsturyayê tê bikaranîn dike. Petter di vê xebata xwe de aliyên kêr ên pîvanên McDonough û Christopher Shaw diyar dike û ew bixwe jî di bin banê sê sernavan de duwanzdeh pîvanan rêz dike: *naverok, bername û organîzeyaya unîteyan, dîzayn, bidestxistin û bikaranîna materyalên alîkar, rêzkirin û senifandin, pêşvebirina çar hûnerwariyên zimanî, rola xwendekaran, guncaviya bikaranînê, guncaviya adaptekirinê, nêrîna mamosteyan, û eleqeya xwendekaran.*

Sheldon<sup>80</sup> di xebata xwe de, hevdeh faktorên pîvanan rêz dike: *sedem (bingeh), bidestxistin, pênaseya bikarhênerî, dîzayn û grafîk, organîzebûn, pevgirêdan (a unîte û mijaran), bijartin û rêzkirina (mijaran), taybetmendiya fîzîkî, guncaviya (ast û temenî), otantîkî, besbûnî, meylên çandî, derbasdariya perwerde, pratîk û dubareyî,*

---

<sup>77</sup> Carol Griffiths, hc.

<sup>78</sup> Jo McDonough, Christopher Shaw, *Materials and Methods in ELT: A Teacher's Guide*, Blackwell, Oxford, 1993 r.63 vgz. Wolfgang Petter, *A Coursebook Evaluation*, 2000. r.9-10. <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/collegeartslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/petter3.pdf> (ketina malperê 20.12.2014)

<sup>79</sup> Wolfgang Petter, *A Coursebook Evaluation*, 2000. r.8-10. <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/college-artslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/petter3.pdf> (ketina malperê 20.12.2014)

<sup>80</sup> Leslie Sheldon, hb.

*guherbarî, rêberî, bihayê pereyî.* Di bin banê van sernavan jî pêncî û du pîvan cih digirin.

Ji bilî nêrîn û pîvanên li jorîn hatine pêşkeşkirin, gelek zanyarên din jî li ser nixandî û bijartina pirtûkan xebitîne. Yek ji van Jeremy Harmer e. Harmer<sup>81</sup> ji bo bijartina hînkeran neh pîvanan (ew bi xwe wek “area” ango “qad” bi nav dîke) rêz dîke: *bihayê pirtûkê, bidestxistin, dîzayn û plansazî, metodolojî, (çar) şîyanwerî, (hebûna) bernameyê, mijar, pêşkeşîya (kesayetan), û pirtûka mamosteyan.* Dema bi hûrgilî li pîvanên Harmer tê nêrîn bi hêsanî diyar dibe ku gelek ji wan bi pîvanên Alan Tucker<sup>82</sup>, Penny Ur<sup>83</sup> û Ansary&Babaii<sup>84</sup> heta bi yê Cunningsworth<sup>85</sup> ve hevpar in.

Ev yek di nixandî û bijartina hînkeran de lihevhatineke navneteweyî nîşan dide. Bi hêsanî tê dîtin ku hemû zanyarên qadê di nixandî û bijartina materyalên hînkeriyê û hînkeran de li ser gelek pîvanên girîng li hev tên.

Di vê xebata xwe de em jî, bi taybetî ji bo hînkerên zimanê kurdî, dê hewl bidin ku lîsteyeke pîvanên nixandî û bijartinê amade bikin. Ev pîvanên me ji hin aliyan ve dikarin di bin bandora pîvanên zanyarên qadê de bin, jixwe wekî li jorîn jî tê dîtin piraniya zanyaran di amadekirina pîvanan de di bin bandora hev de ne. Di pirsyarnameyên ku me ji bo berhevkirina agahî û dîtinên xwendekar û mamosteyan amade kirî û daye tetbîqkirin (bnr. Pêvek 1, Pêvek 2) me hinek ji van pîvanên xwe bi kar anîn. Me bi temamî bîst pîvan diyar kirin û ew di bin heft sernavên giştî kom kirin, ew sernav jî di bin sê çarçoveyên berfireh de cih digirin.

Di çarçoveya ewil de pîvanên derheqê *bername û naverokê* hene û di bin du sernavan cih digirin; *plansazî, naverok û mijar.* Divê kesê ku nixandîna pirtûkê dîke ewil li hebûna bernameyê hînkerinê û li hev hatina wê digel plan, naverok û mijarên hînkerê binêre.

Di çarçoveya duyem de pîvanên *pêşkeşiyê* hene û di bin banê çar sernavên giştî de cih digirin. Ev pîvan li pêşkeşîya rêzimanê û hebûna rahênanan, hînkerina bêjeyan, zimanê vegotinê û hevsengîya çar şîyanweriyên zimanî digerin. Dikare bê gotin ku heke

---

<sup>81</sup> Jeremy Harmer, *How to teach English: An introduction to the practice of English language teaching*, Longman, 2001. r.119.

<sup>82</sup> C.Alan Tucker, hc.

<sup>83</sup> Penny Ur, hc.

<sup>84</sup> Hasan Ansary& Esmat Babaii, hb.

<sup>85</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.15.

bername û plansazî îskeletê pirtûkê bin û heke naverok û mijar jî goştê laşê vî îskeletî bin, pêşkeşî ruhê pirtûkê ye û dîtbarî jî xweşîkiya laşî ye.

Di çarçoveya sêyem de jî pîvanên derheqê *dîtbariyê* cih digirin. Ev pîvan hem li xêz û wêneyên balkêş hem jî li qewînî û qelîteya çapê digere. Lewre hin caran hînker ji aliyê naverok, mijar û pêşkeşiyê ve serkeftî be û ji ber van taybetiyên xwe ji bo bikaranînê bê bijartin jî, ji ber ku wêne û xêzên nebalkêş cih digirin, xwendekar bi dil û hewes ji pirtûkê sûd wernagirin. Dîsa edîsyon û çapa bêqelîte jî dibin sedemên heman bandora neyînî û bi vî awayî feydeyê ku divê ji pirtûkê bê wergirtin kêmtir dikin.

**Tablo 2.4** Pîvanên me yên pêşniyar

<p>➤ <b>BERNAME Û NAVEROK</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>• <b>Plansazî</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Bernameya dersê,</li> <li>○ Unîtekirin û organîzebûna pirtûkê,</li> <li>○ Pirtûk li pêwistiyên xwendekaran tê?</li> </ul> </li> <li>• <b>Naverok û Mijar</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Naverok û mijar li pêdiviyên xwendekaran tên?</li> <li>○ Di naverok û mijaran de zayendên civakî çawa tên temsîlkirin?</li> <li>○ Di naverok û mijarê de çand çawa cih digire?</li> <li>○ Pircûreyiya naverok û mijaran heye?</li> </ul> </li> </ul>
<p>➤ <b>PÊŞKEŞÎ</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>• <b>Pêşkeşiya rêzimanê û rahênan</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Rêzkirin û senifandina rêzimanê li cih e?</li> <li>○ Rêbazên vegotin pêşkeşiya zimanî kêrhatî û modern in?</li> <li>○ Têra pêwistiyên xwendekaran rêziman heye?</li> <li>○ Dûbarekirin û jinûve pêşkeşiya rêzimanê heye?</li> <li>○ Çend cûreyên rahênanan hene?</li> </ul> </li> <li>• <b>Çar şiyanwerî</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Di navbera giraniya çar şiyanwerîyan hevsengî heye?</li> <li>○ Pirtûk bêtir giraniyê dide kîjan şiyanwerîyê?</li> </ul> </li> <li>• <b>Zimanê pirtûkê</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Zimanê vegotinê hêsan e?</li> <li>○ Zimanê vegotinê li gorî ast û temenê xwendekaran e?</li> </ul> </li> <li>• <b>Hînkirina bêjeyan</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Bêjeyên nû çawa tên hînkirin?</li> <li>○ Bêjeyên nû çawa tên dubarekirin?</li> </ul> </li> </ul>
<p>➤ <b>DÎTBARÎ</b></p> <ul style="list-style-type: none"> <li>• <b>Dîzayn</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Wêne û xêzên balkêş hene?</li> <li>○ Grafîkên bikêr hene?</li> </ul> </li> <li>• <b>Qewînî</b> <ul style="list-style-type: none"> <li>○ Qelîteya çap û edîsyonê,</li> <li>○ Qelîteya kaxiz û bergî,</li> </ul> </li> </ul>



### 2.3. MODELÊN NIRXANDINA HÎNKERAN

Zanyarên ku li ser nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û bi taybetî jî nirxandin û bijartina hînkeran berhem dane bi piranî li ser sîstematîkeke diyarkirî tevgeriyane, ango her yekê ji wan modeleke taybet ya nirxandin û bijartina hînkeran ava kirine. Di vê binbeşê de em ê modelên sereke yên di qadê de pêşkeş bikin. Piştî modela xwe ya nirxandin û bijartina hînkeran jî em ê bidin nasîn. Di nav modelan de pêngavên nirxandina hînkeran û fikrên zanyarên qadê jî bi kurtasî dê bê dayîn.

Lê di serî de di derheqê nirxandin û jêgirtina materyalên hînkariyê de divê sê mesele bîn zelalkirin:

- a) Di qada xebatê ya nirxandina materyalên hînkariyê û hînkeran de li gorî armancên nirxandinê bi giştî du cure nirxandin hene; *nirxandina mezin (macro evaluation)* û *nirxandina biçûk (micro evaluation)*. Nirxandina mezin bêtir bi nirxandina giştî ya bernameya dersê û materyalan ve eleqedar e. Bi gotineke din, ev nirxandin ji bo armancên mezin ên pergalê tê kirin. Berevajiyê vê, nirxandina biçûk bi nirxandina yek dersê yan jî kursê û pratîka wan ve eleqedar e. Ango bi armancên nêzîk ên perwerdeyê ve mijûl dibe. Her çî qas bernameya nirxandina hînkeran û materyalên hînkariyê di çarçoveya nirxandina mezin de cih digirin jî, nirxandina wan a ji aliyê mamosteyan ve tê kirin, bêtir di nava nirxandina biçûk de tê hesabandin. Modelên nirxandinê yên ku li jêr dê bîn nasîn dikarin di nava van her du cureyên nirxandinê de bîn hesabandin, lê belê zêdetir bi nirxandina biçûk ve eleqedar in.
- b) Nirxandina hînkeran li du cihan tê kirin. Di *asta dewlet (state level)* de û di *asta herêmî (local level)* de. Di asta dewletê de nirxandin û bijartin ji aliyê wezareta perwerdeyê yan jî ji aliyê desteyeke bilind apisporan ve tê kirin. Di asta herêmî de nirxandin û bijartina hînkeran bi piranî ji aliyê mamosteyan ve tê kirin.<sup>86</sup> Dikare bê gotin ku her çî qas modelên nirxandinê bi her du astan ve eleqedar bin jî, bi piranî bi asta herêmî ve têkildar in, lewre nirxandina ku di asta dewletê de tê kirin bi piranî ji aliyê pisporên qadê ve tê kirin, lê belê mamosteyên ku nirxandin û bijartinê dikin bêtir pêwistî bi rêberekê hene û modelên zanyaran jî ji wan re rêberên bêhempa ne.

---

<sup>86</sup> Sabriye Akış, *hb.r.20-21*.

- c) Di peywenda kurdî (kurmancî) de ji aliyê kapasîteya nirxandinê ve divê hem nirxandina mezin hem jî nirxandina biçûk bi hev re bên kirin lewre, kursên kurdî hewcedarî bi encamên her du cure nirxandinan jî heye. Lê belê ji aliyê astê ve, ji ber ku wezaretek an jî desteyeke bilind a nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran hin jî pêk nehatiye, nirxandina herêmi bêtir li tecrûbeya kurdî tê.

### 2.3.1 Modela Tucker

Alan Tucker di sala 1975ê de, di gotara xwe ya bi navê “Evaluating Beginning Textbooks (Nirxandina Hînkerên Destpêkê)” de modela xwe pêşkeşî raya giştî kir. Modela Tucker li ser sê hemanên giştî ava dibe.<sup>87</sup>

- Komeke pîvanên ku li ser prensîbên bingehîn ên zimanî, psîkolojîk û pedagojîk hûr dibin,
- Pêşnûmayeke nirxdayînê ya ku ji rêbaza diyakirina bikêrhatina pirtûka dersê pêk tê,
- Grafîkeke ku nêrînên nirxînerî yê derheqê pirtûkekê û nêrînên teorîk ên modeleke nirxandinê bi hev re pêşkeş dike, bi vî awayî qîmetdayîna nirxkerî dikare bi hêsanî bê dîtin.

Tucker, di modela xwe de du cure pîvanan bi kar tîne, pîvanên naverokî û pîvanên derveyî (bnr. Tablo 2.2). Pîvanên naverokî li ser naverok, mijar û pêşkeşiya wan disekin. Di nav van pîvanan de sê pîvanên sereke hene: *pîvanên bilêvkirinê* yê li ser bêqisûrî û guncaviya pêşkeşiyê, û bêkêmasiya pratîkê hûr dibin; *pîvanên rêzimanê* yê ku li ser bêkêmasiya mijaran, rêzkirina guncav, bêkêmasiya qalib û pratîkê hûr dibin; *pîvanên naverokê* yê ku li ser bicihkirina kêrhatî, rêjeya daneyan, guncaviya peywend û rewşa daneyan hûr dibin. Pîvanên derveyî jî li ser mijarên wekî otantîkiya zimanî, bidestxistina materyalên alîkar, rêberiya ji bo mamosteyan, qewînî û qelîteya edîsyon û çapê, û biha û nirxê pirtûkê hûr dibin.<sup>88</sup> Modela Alan Tucker yek ji modelên ewil ên qadê ye, ji ber wê taybetmendiya xwe ji bo gelek zanyarên wekî Penny Ur, Hasan Ansary&Esmat Babaii û hwd. bûye modeleke mînak a nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran.

---

<sup>87</sup> Alan Tucker, hc.

<sup>88</sup> Hasan Ansary&Esmat Babaii, hc.

### 3.3.2 Modela Cunningsworth

Alan Cunningsworth di qada xebatê ya nirxandin û bijartina hînkeran de bi du pirtûkan tê nasîn. Pirtûka ewil bi navê “Evaluating and selecting ELT teaching materials” e û di sala 1984an de hatiye çapkirin. Pirtûka duyem jî bi navê “Choosing your coursebook” ya ku di sala 1995an de hatiye çapkirin. Cunningsworth teorî û modela xwe ya nirxandin û bijartina hînkeran di pirtûka xwe ya duyem de pêşkeşî raya giştî kirine.

Di vê pirtûka xwe de Cunningsworth<sup>89</sup> behsa du awayên serekê yê nirxandina hînkeran dike. Awayê ewil *nirxandina rûxalî* ye ya ku bi dîtineke lez, tenê bi nêrîna li berg û naveroka hînkerê hewl dide ku aliyên wê yê serkeftî û yê lawaz derbixe holê û di derheqê taybetmediyên pirtûkê û potansiyelên wê xwe bigehine fikrekê. “Ev awayê nirxandinê bi kêrhatî ye lewre bi rêya wê em dikevin nava materyalê.”<sup>90</sup> Awayê duyem jî *nirxandina hûrgilî* ye ku li analîzeke dirêj û bipîvan a hînkeran digere. Dikare bê gotin ku, di serî de modela nirxandinê ya Cunningsworth, hemû modelên ku em ê di bin vî binnavî de bidin nasîn di çarçoveya *nirxandina hûrgilî* de ne. Lewre modelên nirxandinê xwedî sistematîk û rêzêpîvanan in. Lê ji bo *nirxandina rûxalî* tu sistematîk ne hewce ye.

Herwiha Cunningsworth<sup>91</sup> sê cureyên giştî yê nirxandina hînkeran pêşkeş dike:

- Li gorî wî, ji van cureyan ya herî belave, lê belê di heman demê de ya herî bi zehmet **nirxandina berî bikaranînê** ye. Di vê nirxandinê de armanc lêgerîna potansiyelên hînkerê ye.
- Nirxandina duyem jî **nirxandina di dema bikaranînê de** ye. Li vê derê materyal û hînkerên di halê hazir de te tînin bikaranîn ji aliyê kêrhatiya wan ve tînin nirxandin. Di vê nirxandinê de armanc nûkirin an jî adaptekirina kêmasiyên hînkeran e.
- **Nirxandina piştî bikaranînê** jî li performansa li pey bikaranîna hînkerê digere. Hînker di dawîya serdemê yan jî sala perwerdeyê tê nirxandin û ev nirxandin ji bo diyarkirina kêrhatî an jî kêmasiyên wê tê kirin. Li gorî encamê heman pirtûk tê bikaranîn, adaptekirin an jî guherandin.

---

<sup>89</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.1.

<sup>90</sup> Alan Cunningsworth, hc.

<sup>91</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.14.

Wek me li jor (di çarçoveya binnava 2.2.3 de) jî diyar kir pîvanên di modela Cunningsworth de cih digirin bi piranî di bin banê çar rêberên nirxandinê kom dibin:

Rêbera yekem: Divê hînger li pêdiviyên xwendekaran bê. Divê ew, armancên bernameya hînbûna zimanî bi cih bînin.

Rêbera Duyem: Divê hînger bikaranîna ziman (niha û paşerojê) ya ji aliyê xwendekaran ve tê kirin nîşan bide. Hîngerên ku xwendekaran di bikaranîna zimanî de li gorî armancên xwe pêşve dibe bîn jêgirtin.

Rêbera Sêyem: Divê hînger pêdiviyên xwendekaran li ber çavan bigirin û pêvajoya wan a hînbûnê hêsan bikin, tenê “model”eke hişk nedin wan.

Rêbera Çarem: Divê hînger bi zelalî piştevaniya hînbûnê bikin. Wekî mamosteyan ew jî di navbera zimanê hînbûnê û xwendekaran de navgîn in.<sup>92</sup>

Dikare bê gotin ku ev rêberên li jorîn hatine rêzkirin modela Cunningsworth ji modelên din ên nirxandinê cihê dike, di qada xebatê ya nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hîngeran de wî û modela wî datîne cihekî cuda. Aliyekî din ê ku modela Cunningsworth ji modelên din cihê dike, pêngavên pêvajoya nirxandin û bijartinê ne. Li gorî wî pêvajoya bijartinê ji van pêngavan pêk tê: Pêngava ewil *analîz* e, ku bi awayekî bêalî ji pirtûka dersê dane û agahiyên kom dike. Pêngava duyem *şîrovekirina* van agahiyên berhevkerî ye. “Li vê derê tecrûbeyên mezin û şiyana profesyonel pêwîst e, lewre tiştên di analîzê de veşartî ne tînin dahûrin û meseleyên wekî girîngiya aliyên cuda yê hîngerê tînin hesibandin.”<sup>93</sup> Pêngava sêyem *nirxandin* e û ew jî ji qîmetdayîna li pey şîrovekirina daneyan pêk tê. “Qîmetdayîneke bi vî awayî bivê neyê yekalî (sûbjektîv) ye, lewre heta radeyekê fikr û pêşaniyên nirxkeran nîşan dide.”<sup>94</sup> Pêngava dawî jî *bijartina* materyal an jî hînkera ku herî zêde li armancên perwerdeyê û rewşa taybet a dersê tê.

Wek tê dîtin jî modela Cunningsworth, modeleke pîralî ye. Ji bilî cure, rêber, pêngav û pîvanên nirxandinê, Cunningsworth<sup>95</sup> pêvajoya nirxandinê dabeşî heft qisman dike û pîvanên xwe yê nirxandinê bi piranî di bin banê van qisman de rêz dike.

Em ê niha qismên modela Cunningsworth bi kurtasî bidin nasîn:

<sup>92</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.15-17.

<sup>93</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.9

<sup>94</sup> Alan Cunningsworth, hc.

<sup>95</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.25-108.

1. **Pakêta Hînkerê;** Cunningsworth di vî qismî de li ser du hêmanên pakêta hînkirinê û lihevhatina wan hûr dibe, lewre li gorî wî hînker bi tena serê xwe nabin û pakêta hînkerê ji hêmanên wekî *pirtûka xwendekaran, pirtûka mamosteyan, pirtûka spartekan/rahênanan, test, materyalên xwendinê, materyalên guhdarîkirinê, qasetên guhdarîkirinê, qasetên bilêvkirinê, vîdyo, materyalên komputerî (CALL)* pêk tê.<sup>96</sup> Lê ne hewce, heta mimkun nine ku ev hêman bi temamî di hemû pakêtan de de cih bigirin. Lê belê dîsa li gorî armancên dersê divê hînker ji aliyê hinek ji van hêmanan bê qewîkirin. Digel hebûna van hêmanan lihevkerina van jî girîng e. Cunningsworth di vî qismî de li ser organîzebûna hînkerê jî disekine. Li gorî wî organîzebûna hînkerê ji pêşkeşî, berdewamiya pêşkeşiyê û durbarekirina pêşkeşiyê pêk tê.<sup>97</sup>
2. **Naveroka zimanî;** li gorî Cunningsworth, bingeha naveroka zimanî ji *rêziman, bêje û dengzaniyê (phonology)* pêk tê. Divê bê lêgerîn ka di hînkerê de kîjan mijarên rêzimanê hene û heta çî radeyê li pêdiviyên xwendekar tên.<sup>98</sup> Ji bo bêjeyan jî divê di her astê de herî kêr 1000 bêjeyên nû bên hînkirin û li gorî Cunningsworth divê rahênanên bêjeyan xwedî van taybetmendiyan bin: a) têkiliyên semantikî, b) têkiliyên rewşî, c) rêzikên bihevre (collocations), d) têkiliyên formî.<sup>99</sup> Dîsa Cunningsworth tîne ser ziman ku dengzanî aliyekî girîng ê hînkirina zimanekî ye lê piraniya hînkeran guh nadin vî yekê.<sup>100</sup> Kirpandin aliyekî bingeheke dengzaniyê ye û di hînkerên zimanekî wekî kurdî (kurmancî) yê ku xwedî tîpên hilmî û nehilmî, hişk û nerm û hwd. e, divê girîngiyê bidin dengzaniyê û ji bo hînkirin û hînbûna wê derfetan saz bikin.
3. **Bijartin û senifandin;** Li vî derê mebest bijartin û senifandina mijarên hînkerê ne, lewre bivê neyê ev her du pêvajoyên di bin bandora nêrîna nivîskarê pirtûkê de ne. Cunningsworth dibêje ku di nirxandin û bijartina hînkeran de divê aliyên ku bandor li nivîskarê hînkerê û bernameya (syllabus) wî kirine bên diyarkirin. Li gorî wî bi giştî sê cure bername hene. a) *bernameyên bingehe-naverokî, b) bernameyên strukturel û peywirî, c) bernameyên rewşî û bingehe-mijarî.*<sup>101</sup> Hînkerên zimanî, li ber yek ji van bernameyan tê amadekirin. Di vî qismî de Cunningsworth li ser

<sup>96</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.28

<sup>97</sup> Alan Cunningsworth, hc.

<sup>98</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.32

<sup>99</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.38

<sup>100</sup> Alan Cunningsworth, hb. r. 41

<sup>101</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.54-57.

senifandina mijaran jî sekiniye. Li gor wî senifandin, organzekirina mijaran a di nava hînker an jî bernamêyê de ye û ji *rêzkirin* û *unîtekirinê* pêk tê.<sup>102</sup>

4. **Şiyanwerî;** pêşveçûna zimanekî ji gelek aliyan ve, pêşveçûna di çar şiyanweriyên zimanî (guhdarîkirin, axaftin, xwendin û nivîsandin) de ye. Divê lê bê gerîn ka hînkerê li ber armancên dersê û asta xwendekaran çi qas giranî daye şiyanweriyan. Gelek kes ji bo hînbûna zimanekî, hînkirina rêzimanê û bêjeyan têrê dibinin, lê di eslê xwe de divê naverok û mijarên hînkerê digel pêşveçûna di çar huneweriyên zimanî de bîn hînkin.<sup>103</sup>
5. **Naverok, mijar û nîrxên civakî;** ev qisim bi hêmanên nezimanî (non-linguistic) ên hînkerê ve mijûl e. “Hînkerên zimanî her çiqas navgînên hêsankirina hînbûna ziman bin jî, ne tenê bi vê peywirê ve sînorkirî ne, lewre ziman di weziyetên rastîn de ji bo armancên rasteqîn tê bikaranîn.”<sup>104</sup> Ji ber vê yekê jî divê mijarên hînbûnê ji mînakên rasteqîn ên rojane bîn bijartin. Dema vê yekê dike jî di peywenda civakî û çandî de tevbigere û rol û modelên di civakê de cih digirin jî nîşan bide. Bo mînak, çînen civakî, zayendên civakî û astengdaran jî bihûndirine.
6. **Metodolojî;** li gorî Cunningsworth, çawa ku her hînker li gorî bernamêyekê hatiye amadekirin, herwiha her yek xwedî metodolojiyê hînkirina ziman e jî. Lê ev yek nayê vê manayê ku divê hînker ji bo bikaranîna rêbazekê mamoste û xwendekaran bide zorê. Di vî qismî de armanc haylêbûna rêbaza hînkerê ya hînkirina zimanî, rola ku ew didin xwendekaran û alîkariya wan a hînbûnê ye.
7. **Rola mamosteyan;** li gorî Cunningsworth divê hînker ji bo plankirinê, amadekariyê û pêşkeşiya dersê derfetan bide mamosteyan, herwiha ew rola mamosteyan wek hêsanker, rêber û rêveber pênase dike.<sup>105</sup>  
Cunningsworth digel pîvanên xwe yên giştî, di nava danasîna van her heft qisman de ji bo her yekê pîvanên cuda pêşkeş dike.

### 3.3.3 Modela Harmer

Jeremy Harmer, di pirtûkên xwe yên bi navên “How to teach English” û “The Practice of English Language Teaching” de digel gelek mijarên din ên derbareyê

---

<sup>102</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.59.

<sup>103</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.64.

<sup>104</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.86.

<sup>105</sup> Alan Cunningsworth, hb. r.111

hînkirina ziman, li ser meseleya pirtûkên dersê, û nirxandin û bijartina wan jî disekine û fikrên xwe tîne ser ziman.

Harmer<sup>106</sup> di serî de cudahiyê datine navbera 'pîvana' hînkeran a li derveyî polê ya ku berî bikaranîna tê kirin û 'nirxandina' li pey bikaranîna hînkeran tê kirin. Harmer jî ji bo nirxandina hînkeran lîsteke pîvanan (checklist) pêşniyar dike, lê belê dîsa jî li gorî wî divê ji bo bikaranîna wan pîvanan hin bingegehên sereke hebin, da ku kêmasiyên ji pîvanan derdikevin bikarin bîn beralîkirin.

Modela pîvanê ya Harmer ji sê pêngavan pêk tê. Di serî de **diyarkirina qadên nirxandinê** heye. Ango materyal dê ji kîjan aliyan ve bîn pîvan û nirxandin. *Bihayê pirtûkê, bidestxistin, dîzayn û plansazî, metodolojî, (çar) şiyanwerî, mijar, pêşkeşiya (kesayetan), rahênan, bername-bijartin û rêzkirina mijaran, pirtûka mamoste* hwd. Piştê jî **zelalkirina nêrînan** tê. Di vê pêngavê de her pîvan bi hûrgilî tê nîşandan. Bo mînak ji *şiyanweriyan* mebest çî ye, bi zelalî tê pêşkeşkirin. Herî dawî jî li ser van nêrînan **pirtûk tê pîvan**.<sup>107</sup>

Di modela xwe ya nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran de Harmer ji bilî bikaranîna lîsteya pîvanan ji bo berhevkirina agahiyên ku li ser wan nirxandin bê kirin, sê amûrên din jî pêşniyar dike. Ew jî **qeydên mamosteyan, nîqasha mamosteyan, û bersivên xwendekaran**. "Agahiyên ji bo nirxandinê hatine berhevkirin divê li gorî du pîvanên din (encamên ezmûnan û qewîniya materyalan) jî bîn rêzkirin."<sup>108</sup>

### 3.3.4. Modela McDonough&Shaw

Modela nirxandinê ya Jo McDonough û Christopher Shaw<sup>109</sup> di bin banê du hêmanên giştî kom dibe. *Nirxandina derveyî (external evaluation)* û *nirxandina naverokê (internal evaluation)*. Di nirxandina derveyî de digel *amrazên dîtbarî/bihîstyarî, dîzayna pirtûkê, meyla mijaran, dîroka çapê* hwd. li ser du aliyên hînkerê tê sekinîn: a) îdîayên li ser bergî yê derbareyê pirtûkê bixwe de, b) destpêk û lîsteya naverokê. Lê di nirxandina naverokê de li ser van hêmanan tê sekinîn: *pêşkeşiya*

<sup>106</sup> Jeremy Harmer, *The Practice of English Language Teaching*, r.301.

<sup>107</sup> Jeremy Harmer, hb. rr.301-302.

<sup>108</sup> Jeremy Harmer, hb. r.304.

<sup>109</sup> Jo McDonough, Christopher Shaw, *Materials and Methods in ELT: A Teacher's Guide*, Blackwell, Oxford, 1993 vgz. Wolfgang Petter, *A Coursebook Evaluation*, 2000. <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/college-artslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/petter3.pdf> (ketina malperê 20.12.2014)

(çar) şıyanweriyan, senifandin û rêzkirina mijaran, zimanê naverokê, têkilaya rahênanan û xwendekaran û bikêrhatina pirtûkê ji bo mamoste û xwendekaran.<sup>110</sup>

### 3.3.5. Modela Dougill

Modela John Dougill a nirxandina hînkeran ji çarçoveyeke ku bername, unîte, mijarên naverokê û hêmanên dersê dihewîne pêk tê. Di vê modela xwe de Dougill li ser çar xalên girîng disekine;<sup>111</sup>

1. *Derbasdariya dîtbarî (Face validity)*: Radeya zelalbûna armanc û niyetên hînkerê.
2. *Ajobarîya berhemdar (Generative push)*: Hînker ji aliyê bikaranîna zimanî ve li derveyî polê heta çî radeyê dikare alîkariya xwendekaran bike
3. *Aheng an jî model (Coherence or pattern)*: Hêmanên pakêta hînkerê çî qas li hev tî.
4. *Kûrahiya hîsî (Affective depth)*: Mijar dikare çî qas bandorê li hîsên xwendekaran bikin.

Li gorî Dougill beriya pêvajoya nirxandinê divê temen û profilên xwendekaran, û armancên hînkerê bîr diyarkirin. Ji ber van taybetmendiyan modela Dougill, mirov dikare bêje ku modela wî bêtir li ser bandorên hînkerê ên li ser pêvajoya hînbûnê û xwendekaran disekine.

### 3.3.6. Modela Hutchinson

Tom Hutchinson<sup>112</sup> dibêje ku her materyaleke hînkariyê, nîşaneyê pêvajoya hînkirina ziman e. Modela wî ji çar pêngavan pêk tê. a) *diyarkirina pîvanan*, b) *analîza objektîv*, c) *analîza súbjektîv*, d) *rûberûkirin*.

---


<sup>110</sup> Güncel Arıkan, *Textbook Evaluation in Foreign Language Teaching: Time For English, Grade 4 Teachers' And Students' Views*, (Teza lîsansa bilind a neçapbûyî), Çukurova University Institute of Social Sciences, Adana 2008, r.28

<sup>111</sup> John Dougill, "Not so obvious", *ELT Textbooks and Materials: Problems in Evaluation and Development (ELT Documents 126)*. ed. Leslie E. Sheldon, Modern English Publications/The British Council, Oxford 1987. r.38 vgz. Güncel Arıkan, hb. r.25.; Sabriye Akış, hb. r.44.

<sup>112</sup> Tom Hutchinson, "What's underneath? An interactive view of materials evaluation." *ELT Textbooks and Materials: Problems in Evaluation and Development (ELT Documents 126)*. ed. Leslie E. Sheldon, Modern English Publications/The British Council, Oxford 1987. vgz. Sabriye Akış, hb. r.42.



**Tablo 2.5.** Pêngavên Modela Hutchinson<sup>113</sup>



### 2.3.7. Hin Modelên Din ên Nirxandin û Bijartina Hînkeran

Ji bilî modelên nirxandin û bijartina hînkeran yên li jorîn hatine dayîn, gelek zanyarên din jî derbareyê vê mijarê de model ava kirine. Niha em ê wan jî bi kurtî bidin nasîn.

Alexandra Skierso di gotara xwe ya bi navê “*Textbook selection and evaluation*” a di sala 1991ê de hatiye çapkirin modela xwe ya nirxandin û bijartina hînkeran pêşkeş kiriye. Modela Skierso<sup>114</sup> ji sê pêngavan pêk tê, *lênêrîn*, *analîz*, û *biryargirtin*. Di pêngava ewil de li lîsteya naverokê, fihrist hwd. tê nêrîn da ku bê dîtîna ka pirtûk hêjayî nirxandineke bi hûrgilî ye yan na. Piştê jî, di pêngava duyem de pirtûk ji gelek aliyan

<sup>113</sup> Tom Hutchinson, hc.

<sup>114</sup> Alexandra Skierso, “Textbook selection and evaluation” *Teaching English as a second or foreign language*, ed. Marianne Celce-Murcia, Boston. r.432-453. vgz. Sabriya Akış, hb. r.47.

ve li ber lîsteyeke pîvanan tê analîzkirin. Herî dawî jî li gor encamên analîzê guncavî û neguncaviya pirtûkê tê hesabandin û biryara bikaranînê yan jî destjêberdanê tê dayîn.<sup>115</sup>

Neville Grant di pirtûka xwe ya bi navê “*Making the most of your coursebook*” de modela xwe pêşkeş dike. Di modela wî de sê pêngavên nirxandinê hene; *nirxandina ewil*, *nirxandina bi hûrgilî* û *nirxandina di bikaranînê de*. Di pêngava ewil de pêşgotina pirtûkê, lîsteya naverokan û hwd. ji çend aliyan ve tên lêkolîn. Di vê lêkolînê de lîsteyeke ku heşt pîvanan dihûndirîne tê bikaranîn. Di pêngava duyem de lihevhatina hînkerê digel xwendekar, mamoste û bernameyê tê vekolan û pirsên derbareyî wan tên pirsîn. Di pêngava dawî de jî pirtûk di dema bikaranînê de, tê nirxandin û bi kêrhatina wê tê pîvan.<sup>116</sup>

Modela Grant ji gelek aliyan ve, bi taybetî ji aliyên pêngavên nirxandinê ve dişibe modela Skierso. Ev her du zanyar jî di bin banê sê pêngavan de nirxandina hînkeran pêk tînin. Dikare bê gotin ku pêngava ewil ya her du modelan jî wekî hev in.

Beravajiyê Grant û Skierso modela nirxandin û bijartina hînkeran a Byrd<sup>117</sup> kurtir û pratîktîr e. Ew tenê li *hevhatina hînkerê û bernameyê*, *li hevhatina hînkerê û xwendekaran*, *û hevhatina hînkerê û mamosteyan digere*. Dema lîsteya pîvanan tê amadekirina divê ev lihevhatinên Hînkerê û hêmanên din neyên paşguhkirin.

Wek tê dîtin modelên nirxandin û bijartina hînkeran ên li jorê hatine pêşkeşkirin kêr zêde wekî hev in. Hemû model di nav xwe de nirxandinê pêngav pêngav dikin. Di her modelê de, çi dirêj çi kurt, lîsteyeke pîvanan heye û ev pîvan bingeha nirxandinê pêk tînin.

### **2.3.8. Modela ku em pêşniyar dikin**

Di çarçoveya binnavê 2.2yê de me jî ji bo nirxandina hînkerên zimanê kurdî lîsteyeke pîvanan pêşniyar kiribû. Niha jî em ê hewl bidin ku modeleke nirxandin û bijartina hînkerên kurdî pêşniyar bikin.

Modela me bi giştî ji sê pêngavan pêk tê; *berhevkirina daneyan*, *analîz*, û *bijartin*. Di pêngava ewil de, pirtûk li ber armancên dersê bi awayê dîtbarî û organîzebûnê tê

---

<sup>115</sup> Sabriye Akış, hb. r.47-48.

<sup>116</sup> Neville Grant, *Making the most of your coursebook*, Longman, London 1987. vgz. Güncel Arıkan, hb. r.23-24

<sup>117</sup> P. Byrd, “Textbooks: Evaluation for selection and analysis for implemetation.” *Teaching English as a second or foreign language*, ed. Marianne Celce-Murcia, Boston. r.415-424. vgz. Sabriya Akış, hb. r.48.

vekolîn. Ji vê pêngavê re *nirxandina rûxalî* tê gotin û di lîsteya pîvanên me de jî binnavên *plansazî, dîzayn û qewînî* di derbareyê vê pêngavê de ne. Di pêngava *analîzê* de jî mijarên naverokê, awayê pêşkeşiya wan û rahênan tên vekolîn. Ev pêngav bi *nirxandina naverokê* tê navkirin. Dîsa binnavên lîsteya pîvanan yên wekî *naverok û mijar, pêşkeşiya rêzimanê, çar şiyawerî û hînkirina bêjeyan* di derbareyî vê pêngavê de ne. Di pêngava *bijartinê* de jî biryara dawî tê dayîn, ango biryara bikaranînê, guherandinê yan jî destjêberdanê.

## 2.4. XEBATÊN QADÊ

Di qada xebatê ya nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran de, ji bilî berhemên li ser teorî û modelan, ji aliyê gelek lêkolîner û zanyaran ve berhemên pratîkê, ango berhemên li ser nirxandina hin pirtûkên dersê jî hatine nivîsandin. Ev xebat li hemû dinyayê bi piranî li ser nirxandina hînkerên zimanê inglîzî disekinin. Di vê binnavê de em ê hin xebatên li welatên cuda yên dinyayê û Tirkiyeyê hatine kirin bi kurtî bidin nasîn.

Wolfgang Petter<sup>118</sup> di xebata xwe ya bi navê ‘Coursebook Evaluation’ de li gorî modeleke nirxandinê ya ku ji modela McDonough&Shaw (di vê tezê de bnr. 3.3.4) hatiye adaptêkirin, hînkereke bi navê ‘The NewYou&Me’ a ku li Awûstûryayê tê xwendîn, dinirxîne. Xebata Petter bi giştî ji du beşan pêk tê, di beşa yekem de çarçoveya nirxandinê dide nasîn, di ya duyem de jî li gorî modela xwe nirxandina pirtûka navborî dike.

Andrew White<sup>119</sup> jî di xebata xwe de li ber modela McDonough&Shaw seteke hînkerê a bi navê ‘High Impact’ a li Koreyê tê bikaranîn dinirxîne. White, di xebata xwe de piştî pêşkeşiya agahiyên teorîk ên derbareyê nirxandin û bijartina hînkeran, derbasî nirxandina pirtûka navborî dibe. Hînker li gorî hemû pîvanên McDonough&Shaw yeko yeko tê nirxandin.

Mesoud Khalili û Hojat Jodai<sup>120</sup> di gotara xwe de wan hînkeran dinirxînin ên ku di dibistanên leşkeriyê yên Îranê de tên bikaranîn. Di vê xebatê de, berê teoriya nirxandin

---

<sup>118</sup> Wolfgang Petter, *hb.*

<sup>119</sup> Andrew White, “Evaluation of a ELT Coursebook Based on Criteria Designed by McDonough and Shaw.” <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/collegeartslaw/cels/essays/syllabusandmaterials/AWhite/COURSEBOOKEVALUATIONsyllmat.pdf> (ketina malperê 02.01.2015)

<sup>120</sup> Mesoud Khalili& Hojat Jodai “ Evaluation of Worldview Textbooks; Textbooks

û bijartina hînkeran pêşkeş dikin piştê listeyeke sernavên pîvanan jê digirin û hînkerê li gorî wê listeyê dinirxînin.

Atkins<sup>121</sup> di gotara xwe de nirxandina hînkerê bi navê “Passport” dike a ku li Japonyayê di lîseyan de tê xwendin. Di vê xebata xwe de piştî derstpêkê, modelên nirxandina hînkeran rêz dike, piştê jî hînkerê navborî li gorî modela Mcdonough&Shaw dinirxîne. Di dawiyê de jî listeya pîvanan a Sheldon<sup>122</sup> li gorî hînkerê navborî dadigire û nirxandineke duyem a pirtûkê dike. Ji ber vê taybetmendiya wê dikare bê gotin ku ev xebat nirxandineke bijarteker (eklektîk) e.

Li Tirkîyeyê xebatên di vê qadê de heta niha hatine kirin hem li ser teoriya nirxandin û bijartina pirtûkan hem jî li ser pratîkê ne û pîraniya wan tezên lîsansa bilind û xebatên akademîk in. Li vê derê em ê tenê çend xebatên ku zêdetir li ser teoriya nirxandin û bijartina hînkeran hûr bûne pêşkeş bikin.

Aydemir<sup>123</sup> di xebate xwe de li ser rol û girîngiya nirxandina hînkeran a di perwerdeya zimanê biyanî de sekiniye û modeleke nirxandinê jî pêşniyar kiriye. Di vê xebatê de hînkerê bi navê “Cutting Edge” ya ku li Zanîngeha Osmangazî Dîbistana Amadekariyê tê xwendin li gorî nêrînên mamoste û xwendekaran hatiye nirxandin.

Akış<sup>124</sup> di xebata xwe ya lîsansa bilind de xebateke berawirdî pêk aniye. Di vê xebatê de nêrînên li ser nirxandin û bijartina hînkerên zimanî yê mamosteyên dibistanên dewletê û mamosteyên dibistanên taybet bi awayekî berawirdkirî hatine vekolîn. Li gorî Akış<sup>125</sup> mamosteyên her du dibistanan wek rêbazek *nirxandina di dema bikaranînê* dişopînin û digel vê yekê pîraniya mamosteyan dijberî awayê sîstemîk, di bijartina hînkeran de awayekî nesîstemîk û neakademîk bi kar tînin.

İnal<sup>126</sup> di gotara xwe ya bi navê “Coursebook Selection Process and Some of the Most Important Criteria to be Taken into Consideration in Foreign Language Teaching” de li ser pêvajoya bijartina hînkeran û pîvanên di hînkirina zimanê biyanî de sekiniye. Di vê xebata xwe de listeyeke pîvanên nirxandin û bijartina hînkeran ya ku ji yanzdeh

---

Taught at a Military University”, 2012. <http://files.eric.ed.gov/fulltext/ED529148.pdf> (ketina malperê 05.01.2015)

<sup>121</sup> Andrew Atkins, “An evaluation of the coursebook used for Oral Communication One at a privately funded senior high school in Japan.” <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/college-artslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/atkins3.pdf> (ketina malperê 05.01.2015)

<sup>122</sup> Leslie E. Shelodn, hb.

<sup>123</sup> Mesut Aydemir, *The Role of Coursebook Evaluation in Foreign Language Education in Turkey*, Teza mastirê ya çapnebûyî, Uludag University Institute of Socila Sciences, Bursa 2002.

<sup>124</sup> Sabriye Akış, hb.

<sup>125</sup> Sabriye Akış, hb. r.126

<sup>126</sup> Bülent İnal, hb.

pîvanan pêk tê pêşkeş kiriye (bnr. Tablo 2.3). Pîvanên Înal, bi piranî li ser lihevhatina armancên xwendekaran û mijarên hînkerê hûr dibe.

Di bin edîtoriya Küçükahmet<sup>127</sup> de rêzexebatên li ser nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û pirtûkên dersê hatine amadekirin. Yek ji van bi navê “Konualanî Ders Kitabı İncelem Klavuzu/Yabancı Dil 4-8” li ser nirxandin, vekolîn û bijartina hînkerên zimanê biyanî ye. Di vê xebatê de gotarên ji aliyê zanyar û lêkolînerên cuda ve hatine nivîsîn teoriya nirxandin û bijartina hînkeran pêşkeş dikin.

Li Bakurê Kurdistanê, di peywanda kurdî (kurmancî) de berhem, xebat û nivîsên li ser teoriya perwerdeyê kêr in. Her wiha xebatên li ser qada nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û hînkeran jî bi du nivîsan ve bisînor in. Nivîsa ewil ji aliyê Derînce<sup>128</sup> di sala 2008an de hatiye nivîsîn û li ser materyalên hînkariyê, rola wan a di pêvajoya perwerdeyê de, amadekirin û nirxandina pirtûkên dersê û hwd. disekine. Herçiqa nivîs di şêweyê maqaleyê kurt be jî Derînce hema bêje li ser hemû xalên qada xebatê ya amadekerin, nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê hûr bûye û digel pêşkeşkirina fikrên zanayarên qadê wî bixwe jî di derheqê mijarên navborî de fikrên xwe anîne ser ziman. Di qismê destpêka xebata xwe de Derînce<sup>129</sup> li ser rola materyalên hînkariyê ya di pêvajoya perwerdeyê disekine. Piştî cureyên materyalên hînkariyê pêşkeş dibe û balê dikêşe cudahiya navbera materyalên resen(otentîk) û yên çêkiri. Dûv re, li ser pirtûkên dersê hûr dibe, avantajên bikaranîna wan û tesîrên wan ên neyinî rêz dibe. Di qismê nirxandina pirtûkên dersê jî de pêvajoyê û krîterên nirxandinê rêz dibe û li ser adaptasyona piştî nirxandinê disekine. Herî dawî jî nexşerêyekê ji bo amadekirina materyalên hînkariyê pêşkeş dibe. Ev xebata Derînce, ji ber ku di qada xwe de, bi kurmancî yek ji xebatên ewilîn e, hewl daye ku li ser hemû babatên qadê hûr bibe û bûye kurteyê xebatên li ser nirxandin û bijartina materyalên hînkariyê û pirtûkên dersê.

Nivîsa duyem jî ji aliyê Açar<sup>130</sup> ve ji bo nirxandina qismê kurmancî ya pirtûka dersên hilbijartî hatiye nivîsandin. Nirxandina Açar ji gelek aliyên ve nirxandineke

<sup>127</sup> Leyla Küçükahmet (ed) , *Konualanî Ders Kitabı İncelem Klavuzu/Yabancı Dil 4-8*, Nobel Yayın Dağıtım, Ankara 2001.

<sup>128</sup> M.Şerif Derînce, “Amadekirina materyalên hînkariyê û rola wan” *Zend*, , r.75. Payîz 2008.

<sup>129</sup> M.Şerif Derînce, hc.

<sup>130</sup> Zafêr Açar, “Nirxandina Qismê Kurmancî ya Kitêba Dersa Kurdî ya Hilbijartî ya Pola 5.” *Nûpelda*, j.16, 2014 r.48.

sûbjektîv e, lewre li ber model û pîvanên nirxandinê nehatiye hûnandin. Xebat bi rewşa dersên hîlbijartî yên li Komara Tirkiyê dest pê dike. Piştî armancên xebatê wiha tên pênasekirin: “Em ê jî di vê xebata xwe de qismê kurmancî yê (vê) kitêbê ji aliyê naverok, dîtbarî, ziman û vegotinê ve binirxînin, kêmasiyên ku me dîtine nîşan bikin û pêşniyarên xwe pêşkeş bikin.”<sup>131</sup> Piştî destpêkê û danasîna armancan Açar pirtûkê unîte bi unîte, ji aliyên navborî ve dinirxîne. Aliyên ku Açar hewl dide pirtûkê binirxîne kêm zêde dişibe modelên ku me li jorîn pêşkeş kirine. Lê, tiştê ku xebata Açar dike xebateke bêtir sûbjektîv pêşniyarên wî ne. Ew li cihê gelek peyv û têgehên ji aliyê lijneya amadekar a pirtûkê ve hatine bikaranîn, bêjeyên nû pêşniyar dike, lê belê ji bo van pêşniyaran tu bingeş, çavkanî yan jî standardan nîşan nake.

---

<sup>131</sup> Zafer Açar, hc.

## BEŞA SÊYEM

### RÊBAZ

Di vê beşê de dîzayna xebatê, pirsên lêkolînê, sînorên xebatê, beşdarên lêkolînê, pêvajoya komkirina agahiyên, pêvajoya analîzkirina agahiyên komkirî û amûrên komkirina xebatê dê bê pêşkeşkirin. Herî dawî jî, danasîna pirtûka xebatê *Hînkêrê* bê kirin.

#### 3.1. Modela Xebatê

Ev xebat li ser nêrînên komeke mamoste û xwendekarên disekine, yê ku pirtûka hînkirina kurdî (zaravayê kurmancî), *Hînkêr*<sup>132</sup>ê wek pirtûka dersê bi kar tînin. Ev xebat xebateke çendahî (quantitative) ye lewre ji bo diyarkirina nêrînên xwendekar û mamosteyan ên li ser *Hînkêrê* ji agahiyên statîkî sûd hatiye wergirtin. Herwiha xebata me xebateke teswîrî (descriptive) ye lewre li têgehiştin, temamkirin û senifandina daneyên derbareyê *Hînkêrê* digere û niyeta guherandin û kontrolkirina wan nahundirîne.<sup>133</sup> Wek modela xebatê jî modela survey (lêgerîn) hatiye bijartin lewre ev model di nava xebatên teswîrî de cih digire

#### 3.2. Meydana Lêkolînê û Beşdar (Sample)

Çarçoveya lêkolînê temamê wan hêmanên in ên ku vekolîn li ser tê kirin. Ji bo xebata me jî çarçoveya lêkolînê hemû xwendekar û mamosteyên *Kurdî-Derê* û *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* ne. Lêkolîna li ser 104 xendekar û 20 mamosteyên *Kurdî-Derê* hatiye kirin vê xebatê pêk tîne, ango nimandina lêkolînê li ser 104 xwendekar û 20 mamosteyan hatiye birêvebirin. Ji bo xebatê xwendekar û mamosteyên *Kurdî-Der Navend* û yê ku *Kurdî-Der Şaxa Wanê* û xwendekar û mamosteyên *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê* hatine bijartin, ku ew hemû jî *Hînkêrê* wekî pirtûka hînbûna kurmanciyê bi kar tînin.

---

<sup>132</sup> *Hînkêr Astayekemîn/Duyemîn/ Sêyemîn*. amd. Samî Tan, Ronayî Onen, Mevlût Aykoç, Sadik Varli, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, 2013.

<sup>133</sup> Şener Büyüköztürk, *Sosyal Bilimler İçin Veri Analizi El Kitabı*, Pegem Akademi, Ankara 2010, r.5.

### 3.3. Amûrên Komkirina Agahiyên

Di vê xebatê ji bo komkirina agahiyên derbareyê nêrînên xwendekar û mamosteyên ku *Hînkere* wek pirtûka dersê bi kar tînin, rêbaza pirsyarnamê hatiye bikaranîn. Stîla Lîkert di pirsyarnamêyan de hatiye tercîhkirin, lewre qismê bersivan ji bo pîveka pilebilindiyê (rating scale) ji “qet ne rast e”yê heta “teqez rast e” bûye 5 parçe. Ji bo xwendekar û mamosteyan pirsyarnamêyan ji hev cuda hatine amadekirin, lê belê di her du pirsyarnamêyan de pirsên wekî hev û nêzî hev jî cih digirin. Pirsyarnamêyan xebatê ji heft beşan pêk tên.

Beşa yekem Derbareyê *dîzayn* û *plansaziya Hînkere* de, beşa duyem derbareyê *pêşkeşiya rêzimanê* de, beşa sêyem derbareyê *zimanê pirtûkê û bêjeyên hatine hilbijartin* de, beşa çarem derbareyê *rahênanan* de, beşa pêncem derbareyê *naverok û mijarê* de, beşa şeşem derbareyê *çar şiyanweriyan* de û beşa heftem derbareyê *nirxandina awî: daxwaz û pêşniyaran* de ye û pirs li gorî van hatine amadekirin.

Beşên pirsyarnamêyê li gorî xebatên qadê û li ber modelên nirxandin û bijartina hînkaran hatine amadekirin. Pirsên di pirsyarnamêya me de cih digirin zêdetir li ber lîsteya pîvanên Cunningsworth<sup>134</sup>, McDonough û Shaw<sup>135</sup> hatine amadekirin.

### 3.4. Tetbîqa Pîlot

Pirsyarnamêyan ku ji bo xebatê hatine amadekirin, berê ji bo derbasdariya (validity) wê ji pispor, zana û akademîsyenên qadê re hatin şandin, li gorî nêrînên wan hin guhertinên naverokê û şeweyî di metnê pirsyarnamêyê hat kirin. Piştê ji bo pêbaweriya (reliability) tetbîqa pîlot (pilot scheme) hat bikaranîn. Tetbîqa pîlot a pirsyarnamêyan xebatê di gel 29 xwendekar û 4 mamosteyan hat pêkanîn. Berê ji beşdaran re derbareyê pirsyarnamêyê de agahî hat dayîn û piştê jî ji bo dagirtina pirsyarnamêyê ji wan re 40 deqîqe dem hate dayîn. Tetbîqa pîlot ji bo pêbaweriyê (reliability) xebatê hat pêkanîn. Ji bo analîzkirina agahiyên ji tetbîqa pîlot hatine peydakirin bernameya SPSS-18 hat bikaranîn. Ji bo tabloya derbareyê encamên tetbîqa pîlot bnr Pêvek 3 û Pêvek 4.

---

<sup>134</sup> Alan Cunningsworth, hb.

<sup>135</sup> Jo McDonough, Christopher Shaw, *Materials and Methods in ELT: A Teacher's Guide*, Blackwell, Oxford, 1993 vgz. Wolfgang Petter, *A Coursebook Evaluation*, 2000. <http://www.birmingham.ac.uk/Documents/college-artslaw/cels/essays/sylabusandmaterials/petter3.pdf> (ketina malperê 20.12.2014)



### 3.5. Pêvajoya Komkirina Agahiyan

Berê ji beşdarên re di derbareyê pirsyarnamê de agahî hat dayîn û piştê jî ji bo dagirtina pirsyarnamê ji wan re 40 deqîqe dem hate dayîn.

### 3.6. Pêvajoya Analîzkirina Agahiyan

Di vê xebatê de hem agahiyên çawahî, hem jî agahiyên çendahî hatin bidestxistin. Ji analîzkirina agahiyan bernameya îstatîkê ya bi navê SPSS-18 hat bikaranîn.

Piştê frekans, navinc (mean), parsed (percentage) û rêberdana standart (Standart deviation) hatin hesapkirin. Di pirsyarnamê de heft beş hene, ji bo her beşê frekans, navinc, parsed, rêberdana standart cuda cuda hatine hesapkirin. Herwiha ji bo her xalê jî frekans, navincî, parsed, rêberdana standart, û xeletiya standart (standard error) hatine hesap kirin. Ji bo analîzên derbareyê cudahiyên di navbera navinciyan jî T-testa serbixwe, varyansa yek alî (ANOVA), û testên Scheffe û Kruskal Wallis-H (KWH) sûd hatiye wergirtin. Pileye watedarbûnê (p) 0.05 hatiye qebûlkirin.

**Tablo 3.1. Navberên Puanan, Pileyên Tercihan û Kategoriyên Nirxandinê ji bo Navinciyên Arîtmêtîk**

Navberên Puanan	Pileyên Tercihan	Pileyên Nirxandinê
1.00-1.80	Qet Ne Rast e	Gelekî Kêm
1.81-2.60	Ne Rast e	Kêm
2.61-3.40	Piçek Rast e	Normal
3.41-4.20	Rast e	Baş
4.21-5.00	Tegez Rast e	Gelekî baş

### 3.7. Pirsyarnamê Xwendekaran

Pirsyarnamê xwendekaran ji sê qismên pêk tê. Di qismê ewil de derbareyê xebat û pirsyarnamê de agahdarî cih digire. Di qismê duyem de derbareyê agahiyên şexsî çend ta pirs hene. Qismê dawî yê pirsyarnamê jî ji forma pirsên pirsyarnamê pêk tê. Ev qismê dawî ji heft beşan pêk tê û ew beş wiha ne: *Dîzayn û plansaziya Hînkere, pêşkeşiya rêzimanê, zimanê pirtûkê û bêjeyên hatine hilbijartin, rahênan, naverok û mijar, çar şîyanwerî, nirxandina dawî: daxwaz û pêşniyar*. Di pirsyarnamê

xwendekaran de bi temamî 54 pirs hene. Li tabloya jêrîn beşên pirsyarnamêyê û hejmara pirsên di her yekê de cih digirin hatine pêşkeşkirin.

**Tablo 3.2. Tabloya Kategorî, Hejmara pirsan û Encamên Analîza Pêbaweriyê ( $\alpha$ ) yên Pirsyarnamêya Xwendekaran**

Kategorî	Hejmara pirsên pirsyarnamêyê	Analîza pêbaweriyê ( $\alpha$ ) pirsyarnamêyê
	Tetbîqa pîlot	Tetbîqa pîlot
Dîzayn û plansaziya Hîngerê	7	0,895
Pêşkeşiya rêzimanê	7	0,890
Zimanê pirtûkê û bêjeyên hatine hilbijartin	10	0,842
Rahênan	11	0,915
Naverok û mijar	6	0,772
Çar şiyanwerfî	7	0,897
Daxwaz û pêşniyar	6	0,613
Sercem	54	0,974

Li gorî tabloyê di tetbîqa pîlot a ku li ser 29 xwendekaran hatiye tetbîqkirin, pêbaweriyê pirsyarnamêyê ( $\alpha = \alpha$ ), 6 kategorî “gelekî pêbawer” in ( $0.60 \leq \alpha < 0.90$ ) û kategorîyek û herwiha sercem xwedî “pêbaweriyê bilind” in ( $0.90 \leq \alpha < 1.00$ ).<sup>136</sup> Ji ber vê van nirxên bilind ên pêbaweriyê ne li cih bû ku tu xal ji pirsyarnamêyê bên derxistin, lewma pirsyarnamêya xwendekaran bi 54 xalan ve ji bo xebatê hat bikaranîn.

### 3.8. Pirsyarnamêya Mamosteyan

Qismên pirsyarnamêya mamosteyan û ya xwendekaran wek hev in. Herwiha qismê dawî jî yê pirsyarnamêya mamosteyan wekî pirsyarnamêya xwendekaran ji heft beşan pêk tê. Berî tetbîqa pîlot 68 pirs di forma pirsyarnamêyê de hebûn, lê piştî tetbîqa pîlot li gorî encamên pêbaweriyê ( $\alpha$ ), 5 pirs ji pirsyarnamêyê hatin derxistin. Beşên pirsyarnamêya mamosteyan, hejmara pirsên di her beşê de cih digirin û nirxên analîza pêbaweriyê yên tetbîqa pîlot û tetbîqa esil li tabloya jêrîn hatine pêşkeşkirin.

<sup>136</sup> Abdullah Can, *SPSS ile Bilimsel Araştırma Sürecinde Nicel Veri Analizi*, Pegem Akademi Yayınları, Ankara 2013. r. 343.

**Tablo 3.3. Tabloya Kategorî, Hejmara pirsan û Encamên Analîza Pêbaweriyê ( $\alpha$ ) yên Pirsyarnameya Mamosteyan**


Kategorî	Hejmara pirsên pirsyarnameyê		Analîza pêbaweriyê ( $\alpha$ ) pirsyarnameyê	
	Tetbîqa pîlot	Tetbîqa esil	Tetbîqa pîlot	Tetbîqa esil
Dîzayn û plansaziya Hîngerê	10	10	0,797	0,797
Pêşkeşiya rêzimanê	7	7	0,686	0,686
Zimanê pirtûkê û bêjeyên hatine hilbijartin	13	13	0,677	0,677
Rahênan	16	11	0,344	0,827
Naverok û mijar	7	7	0,883	0,883
Çar şiyarwerî	7	7	0,892	0,892
Daxwaz û pêşniyar	8	8	0,746	0,746
Sercem	68	63	0,949	0,949

Li gorî tabloyê di tetbîqa pîlot a ku li ser 4 mamosteyan hatiye tetbîqkirin, pêbaweriyê pirsyarnameyê ( $\alpha=\alpha$ ), 6 kategorî “gelekî pêbawer” in ( $0.60 \leq \alpha < 0.90$ ) û sercem xwedî “pêbaweriyê bilind” e. ( $0.90 \leq \alpha < 1.00$ ). Lê belê nirxê pêbaweriyê yên kategoriya “Rahênan”yan “Pêbawer nîn e” ( $0.00 \leq \alpha < 0.40$ )<sup>137</sup>, lewre ji vê kategoriye 5 xal hatine derxistin û pileya pêbaweriyê wê hatiye bilindkirin ( $\alpha=0,827$ ).

### 3.9. Pirtûka Xebatê: *Hînger* û Rêzkirina Unîteyên Wê

*Hînger*, ji bo hînkirina zimanê kurdî (kurmancî) hatiye amadekirin. Ji sê pirtûkan pêk tê, her pirtûk ji bo astekê hatiye amadekirin. Pirtûka ewil ji 112 rûpelan, ya duyem ji 128, û ya sêyem jî ji 160 rûpelan pêk tê. Li ser bergê pêşî û yê paşî her pirtûkê wêneyek ji Kurdistanê heye.

<sup>137</sup> Abdullah Can, hc.



**Wêne 3.1 Bergên pêşî û paşiyê yên HÎNKERê.**

Digel *Hînkere* pirtûka spartekan nîne, li şûna wê di dawiya her unîteyê de beşeke bi navê “Spartek” heye û ev beş derbareyê mijarên di unîteya borî de derbasbûne rahênanan dihûndirîne. Pirtûka “Asta Yekemîn”, wek di bergê paşiyê de tê gotin ji bo kesên ku qet kurmancî nizanin hatiye amadekirin. Pirtûkên di jî ji bo kurmancîaxêvan û kesên ku ji asta ewil derbasbûyîne hatine amadekirin.

Nav û asta pirtûkê, navên nivîskaran û weşanxaneyê li ser rûyê bergê pêşiyê cih digirin. Li ser rûyê bergê paşiyê jî nav û asta pirtûkê digel agahî û raveyên derbareyê amadekirina pirtûkê, mebestên wê û naveroka wê hatine rêzkirin. Di nava bergê pêşiyê de kûnyeya pirtûkê hatiye rêzkirin. Di rûpelê ewil de dîsa nav, ast, nivîskar û weşanxaneya pirtûkê hatine nivîsîn. Di rûpelê duyem û sêyem de tabloya naverok û plana pirtûkê hatine dayîn. Mijar, rêziman, armanc û peyvên her unîteyê di vê tabloyê de cih digirin.

UNÎTE	MIJAR	RÊZIMAN	ARMANC	PEYV
<b>Destpêk</b>	A- Alfabe r. 4 B- Ferman r. 6 C- Rojbaş r. 7	1- Alfabe	1- Dê alfabayê hîn bibin.	1- Hîn peyvên rojane têne bikaranîn.
<b>1 Hevnasîn</b>	A- Hevnasîn r. 8 B- Lihevpirsîn r. 10 HÎNDARÎ r. 11 C- Nasîna kes û tiştan r. 12 HÎNDARÎ r. 18 UNÎTE 1 - SPARTEK r. 19-21	1- Cînavkên kesane yên tewandî 2- Cînavkên kesane yên xwerû 3- Qertafên kesane 4- Cînavkên şanîdanê yên xwerû 5- Cînavkên pirsîyariyê yên xwerû	1- Dê bi vê unîteyê hînî hîn hevokên bingehîn bibin. 2- Dê bikaribin xwe bidin nasîn û hevalên xwe nas bikin.	1- Navên alav û navgînên di fêrgehê de 2- Hîn peyvên rojane têne bikaranîn.
<b>2 Kar û pişe</b>	A- Hejmar r. 22 HÎNDARÎ r. 23 B- Kar û pişe r. 24 HÎNDARÎ r. 26 C- Cih r. 28 D- Heye / Hene r. 29 UNÎTE 2 - SPARTEK r. 30-31	1- Hejmar 2- Daçek 3- Qertafên nebinavkirinê	1- Dê hewl bidin ku navên pişeyan hîn bibin. 2- Dê hewl bidin ku hevokên bi pişe û cih-pirsînê ve girêdayî hîn bibin û bi kar binin. 2- Dê hejmaran hîn bibin.	1- Navên pişeyan 2- Hejmar 3- Hîn peyvên rojane têne bikaranîn.

Wêne 3.2 Tabloya naverok û plana *HÎNKERê*.

### 3.9.1 Organîzebûna *Hînkere* û Unîteyên Wê

Her pirtûk ji unîteyêke destpêkê, heşt unîteyên xweser û pêvekekê pêk tê. Jimare, nav û mijarên her unîteyê di destpêka unîteyê de cih digirin.



Wêne 3.3 Destpêka unîteyêkê.

Di destpêka her unîteyê de armancên unîteyê cih nagirin, lê belê peyv û têgehên di bin navê unîteyan de hene derbareyê naveroka unîteyê de dikarin wek delîl bînin. Hêmanên unîteyan sistematîk nînin. Li gorî mijarên di destpêkê de cih digirin dabeşkirina di nava unîteyan de tê kirin.

### 3.9.2 Pêşkeşiya Rêzimanê

Di pirtûkan de piştî pêşkeşiya mijaran, rêzimana di wan mijaran de cih digirin tê ravekirin. Bi vî awayî dikare bê gotin ku wek rêbaza pêşkeşiya mijarên rêzimanê rêbazê dedûksiyonê hatiye bikaranîn. Ravekirina mijarên rêzimanê bi piranî di nava tabloyekê de tê kirin. Piştî ravekirinê, bi piranî rahênanên derbareyê mijara navborî cih digire. Bi vî awayî, derfeta dubarekirin û bikaranîna mijara navborî derdikeve holê.

Dema Niha				
cînavk	qertafa dema niha	rayek	qertafa kesane	hevok
Ez	di	ç	im	Ez diçim / naçim.
Tu			î	Tu diçî / naçî.
Ew			e	Ew diçe / naçe.
Em			in	Em diçin / naçin.
Hûn			in	Hûn diçin / naçin.
Ew			in	Ew diçin / naçin.

**2- Lêkerên di nava kevanekê de li gorî dema niha bikişînin.**

1- Rojîn sêvekê _____ (xwarin)	5- Ez _____ (na/raketin)
2- Tu çayê _____? (vexwarin)	6- Em _____ (na/gerîn)
3- Azad _____ dibistanê. (çûn)	7- Rojda gulên _____ (na/çinîn)
4- Em li filmekî temaşe _____ (kirin)	8- Pelên daran _____ (weşîn)
	9- Ez cilan _____ (şûştin)

**Veqetandekên binavkirî**

-a (yekjimar - mê)    -ê (yekjimar - nêr)    -ên (pirjimar)

-a; mala min, meta min, xwişka te, gula sor, dara gûzê, keça dirêj...  
*Mala min li Amedê ye.*  
*Keça te xweşik e.*

-ê; xaniyê me, birayê min, apê te, xortê delal, deriyê mezin...  
*Xaniyê me mezin e.*  
*Apê min ajokar e.*

-ên; birayên min, mêvanên me, temaşevanên hêja...  
*Birayên min xwenda ne.*  
*Mêvanên me ji Wanê ne.*

**4- Di nivîsa li jêr de veqetandekên bi cih bikin.**

**Minak**      Kurên xwişka hevserê min xwendekar in.

Nav\_\_ diy\_\_ min Delal e. Ew çil salî ye. Por\_\_ wê reş e. Çav\_\_ wê qehweyî ne. Bejna wê dirêj e. Bav\_\_ min çil û çar salî ye. Nav\_\_ wî Rêşad e. Por\_\_ wî qehweyî ye. Çav\_\_ wî hingivîn in. Ap\_\_ min heye. Navê wî Serdar e. Ew parêzer e. Navê jinap\_\_ min Selma ye. Ew rojnamevan e. Ew gelekî henûn e. Navê pismam\_\_ min Bahoz e. Ew dozdeh salî ye. Ew çavreş e. Ew yekî jîr e.


### Wêne 3.4 Pêşkeşiya hin mijarên rêzimanê û rahênanên derbareyê wan de

### 3.9.3 Çar Şiyanwerî

Di pirtûkê de di navbera çar şiyanweriyên zimanî (axaftin, guhdarîkirin, xwendin û nivîsîn) de hevsengî nîne. Di asta yekemîn de li du cihan çalakiyên xwendinê


û li heşt cihan jî çalakiyên nivîsînê û rahênanên derheqê wan hene. Li tu cihê pirtûkê çalakiyên derheqê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê nînin.

Di pirtûka duyem de jî li sê cihan çalakiyên xwendinê û li sêzdeh cihan çalakiyên nivîsînê û rahênanên derbareyê wan cih digirin, dîsa di derbareyê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê tu çalakî nînin.



### Wêne 3.5 Çalakiyeke nivîsînê

Di pirtûka sêyem de li çar cihan çalakiyên xwendinê û li şeş cihan jî çalakî û rahênanên derbareyê nivîsînê hene, lê li tu cihên pirtûkê çalakî û rahênanên derbareyê şiyanweriyên axaftin û guhdarîkirinê cih nagirin.



### Wêne 3.6. Çalakiyeke xwendinê û rahênanên derbareyê wê de.

### 3.9.4. Hînkirina Peyvên Nû

